


**S**erokê Baroya  
Stenbolê Yücel  
Sayman dide  
xuyakirin ku,  
Tırkiye ne dew-  
leteke hiqûqî ye. Ew, se-  
dema lênepirsîn û hel-  
westnegirtina raya giştî  
ji wiha rave dike: "Ev  
bûyer hem di ser emni-  
yetê hem ji di ser hikû-  
metê re ye. Lewre ew ni-  
karin bi ser de biçin."  
Her wiha Sayman da  
zanîn ku, ne tenê Akın  
Birdal, niha gelek rojna-  
meger ji kar hatine avê-  
tin. Bi baweriya wî, ev ji  
nîşan dide ku, ew çete-  
yên ku di nav Bûyera  
Susurlukê de bûn, niha ji  
di nav mekanîzmayên  
dewletê de xwedî raye  
ne.

Mükel 3



Bilal Vural û Hakim Atik roja 4'ê gulanê ji  
aliyê ülküciyyen faşist ve batin birîndarkirin.  
Bilal Vural di cib de şebîd ket. Hakim Atik  
piştî bûyerê bi 15 rojan, li nexweşxaneyê kete  
nav karwana şebîdan. Bi sedan mirovên  
welatparêz, Hakim Atik bi slogan û çepikan bi  
rê kir. Li aliyê din rayedarên Tırkiyeyê  
berdevkiya çeteyan dikin û didin xwe ku  
erîşen çeteyan rewa nîşan bidin.

**Serokê Baroya**  
**Stenbolê Yücel**  
**Sayman:**

# Çete di ser hikûmetê re ne

Niviskar Naci Kutlay:  
Kurdên xwende  
xwe dane alî


R. 8-9

Kemal Mehfüzê Misirî:  
Serxwebûna kurdan  
mafekî suriştî ye

R. 4

Viranîn-Zülküf Kisanak:  
Ti biya astarik û Kurdistan  
de akewta, embaza Gurbetelli

R. 6



SAMİ TAN

Dagirker li gorî giraniya wan, saziyan dinirxînin.

Dema rojname di nava tengasiyê de bû, zêde bala wan nedikişand. Lê pişti ku hinek gav bi pêş ve hatin avêtin, nihêrîna wan jî guherî.

**B**erî niha bi çend mehan di-vî qunçikî de, em li ser tengasiyê rojnameyê rawestiyabûn. Di wê nîvîsî de hatibû gotin ku dema mirov bi bêhneke fireh li ser arîşeyan raweste û bi ser jêderka wan de biçe, mirov dê ji sedî sed bi ser bikeve.

Niha mirov dikare bibêje, ev dîtina me ji layê karwaniyê ve hate peyitandin. Îro hinek gavên ku hatin avêtin, berhemêن xwe didin. Gelek pirsgirêk hatine çareserkirin. Edî em ji tirs û sawa berê dûr in. Bingeha rojnameyê xurtir bûye, rojnameyê hebûna xwe misoger kiriye. Lê bi tu awayî mirov nikare bibêje, arîşeyen heyî ji binî ve ji holê rabûne, rojname edî rastî tu tengasiyan nayê.

Em tu çaran nakevin nava xewn û xeyalîn bi vî rengî. Lewre, Azadiya Welat rojnameya geleki ku şerê hebûn û nebûna xwe dide ye. Gelê kurd di vî şerî de çeperên girîng bi dest xistine.

Digel ew qas êrîşen tund jî destdana wan çeperan deynin aliye, her roj çeperen nû bi dest dixe.

Lê hê jî şer di her warî de û bi domdarî tê meşandin. Her du aliye şer jî, ji bo hêza li hemberî xwe têk bibin, serê her kîliyê plan û tevdîrên nû digirin, dest davêjin taktilkên nû.

Rojnameya geleki ku di nava şerekî wiha de ye, nikare planen xwe li gorî rewşa asayı bike; lingê xwe li lingê rojnameyê gelên xwedî dewlet bigire. Divê xebatkar û xwendavanen vê rojnameyê ji her cure rûdan û qewimînên nû re amade bin. Em jî bi vî çavî rewşa dinirxînin û ji bo ku bersiva daxwazan gel bidin xebatê dikan. Armanca vê xebatê şikînandina bandora şerê derûnî yê dagirkeran e. Hêzên dagirker ji bo ku iradeya gelê me teslim bigirin, şerekî rojane dimeşînîn, divê em ji bersiva wan, rojane bidin. Bi xebateke wiha sazî zêdetir bala gel dikişine.

Dagirker jî li gorî giraniya wan, saziyan dinirxînin. Dema rojname di nava tengasiyê de bû, zêde bala wan nedikişand. Lê pişti ku hinek gav bi pêş ve hatin avêtin, nihêrîna wan jî guherî.

Dema hejmara xwendekarê rojnameyê zêde bû, vê yekê yekser bala dozgeren DGM'ê kişand û ji nişka ve doz li hejmareke rojnameyê vekirin. Heke rewşa rojnameyê baştir bibe, ew dê dest bavêjin 'bergirî' yên nû.

Niha em amadekariya hin gavên nû dikan, ew jî di cih de bersivê didin. Bo nimûne em li hin cihan amadehiya vekirina nûnergehan dikan, hêzên dewletê ji dest bi girtina nûneren me kirin. Hefteya çûyi nûnera me ya İzmîrî hate binçavkirin; polîsan gefa kuştinê lê xwarin. Ev êrîş, her wekî çawa nikarin doza azadiyê li paş bixin, wisa jî nikarin vîn û daxwaza me ya xurtkirina rojnameyê kêm bikin. Bersiva êrîşan wê bi gavên pêşketîr bê dayîn.

# Wateya jiyana 18'ê gulanê

## GIRTIGEHA BARTIN

**H**er tişt di jiyanê de, jiyan jî di minîne de veşarı ye. Bi awayekî za-nîstî mirin vê yekê ifade dike. Ji bo vê ji mirin ne dawiya jiyanê ye, carinan jî destpêka jiyanê ye. Anglo vejin e. Ji vejinê jî mirineke bi şeref, zil dide. An jî bi wateyeke din mirin, gava jiyanê ya yekemîn e.

Qetilkirina rihe xwezayê, afirandîna rihekî çêkirî ye. Rihekî çêkirî jî, mirineke zindî ye. Ne vîn'ne ji raman tê de heye. Yan ji canekî mekanik e. Bi riya vîna derive, dikeve nav lebatê. Ji dûr ve, dema ku însan li vê lebatê mîze bike, belkî bêje ev ji jiyan e. Ev ewr, ne ewrekî tendirust e. Çimkî jiyan bes bi aliye xwe yê berbiçav, rastiya xwe nade der. Pêwîst e ku jiyan di cewher û rih de bê şirovekirin. Her tişt di vir de veşarı ye. Berxwedan û teslimiyet, vîn û koletî di vir de diyar dide. Ronahiya vê jî di lêhûrbûna jiyanê re derbas dibe. Lêhûrbûn şerê zelalbûn û fêmkirina jiyanê ye. Cihê ku jiyan lê bê fêmkirin jî, qirkirina rih ji laş çiqas xeternaktir e, ew jî wê bê fêmkirin. Teslimiyet, di qetilkirina rih de ye. Lewre, qetilkirina rih jî di jiyanê de bi kar tê. Ev rûyekî jiyanê ye. Lê rûyekî reş e, bêbext e.

Fêmkirina jiyanê, di jiyanê de teslimiyetê qebûl nake. An bi lehengî dijî an jî bi lehengî jî bo jiyanê, canê xwe feda dike. Ev jî rûyê jiyanê yê duyemin e. 18'ê gulanê bi vî rûyê xwe, di dîrokê da bûye rûpeleke spî. 18'ê gulanê di rewseke

miş xedar de, -li dijî politikaya kuştina rih a itîrafkariyê, di bin reberiya rîhevâlîn leheng Ferhat, Necmî, Mehmedû Eşref de mora xwe li dîrokê daye.

Di mercen wisa zor de, dema jiyan di rihehî çar lehengan da dibe hêlîna berxwedanê, bêguman berxwedan jî dibe ava jiyanê ya zelal.

Însan di jiyanê de li ber xwe dide. Hem li dijî dagirkeriyê hem jî li dijî newxeşîyen navxweyî. Berxwedan hêlîna ji-

"însan jî ci hez bike, ji wi ditirse, lê jî ci bitirse jê hez nake." Hezkirina can, bi tenê ne hezkirina netewe û gel e. Barê neteweyê, barekî giran e. Xwîn pêwîst be xwîn e, can pêwîst be, can fedabûnê dixwaze. Xwoperestî ji vê ditirse, ji bo vê jî jê hez nake.

"Agir venemirînin, agir gur bikin, yê ku agir vemirîne sîxur e". Nûbûna zanyaryê, di vir de pir zelal e. "Însan jî ci hez bike, ji wi ditirse, lê jî ci bitirse jê hez nake."

Yê ku ji canê xwe hez bike, di mercen teng de, bi hêsanî dikare serê xwe li hemberî êrîşen li ser wî bitewîne. Hezkirina can, bi tenê ne hezkirina netewe û gel e. Barê neteweyê, barekî giran e. Xwîn pêwîst be xwîn e, can pêwîst be, can fedabûnê dixwaze. Xwoperestî ji vê ditirse, ji bo vê jî jê hez nake.

18'ê gulanê redkirina vê felsefeyê ye. Lewre, felsefeyê 18'ê gulanê, felsefeyê internasyonalîst, hezkirina ji însaniyetê û girêdانا bi însaniyetê ve ye. Her wiha jî, hezkirina ji însaniyetê, ne hezkirina ji xwe ye. Însanekî/e ku xwediyyê vê taybetiyê be, çiqas ji netewe û gelan hez bike, ew qas jî jê ditirse. Ditrise ku, wê bi ci metodê neteweyê pêk bîne. Ji bo avakirina neteweyê şexsiyeteke çawa pêwîst e. Ev psikoloji wî dixe hewlîn legerîna tedbiran. A gîrîng tedbirâ li hemberî kesayetiye ye. Ji bo ku kesayef bikaribe vê peyvirê bi cih bîne, pêwîst e biafrîne.

Van kesan, ev zanyari, di destpêkê de dîtin, fêm kirin û bi cih anîn. Di vir de dîtin yekîtiya hest, raman, karakter, vîn û coşê gengaz e. Jiyan di vê pêvajoyê de careke din, karaktera xwe ya xwezayî li xwe dike. 18'ê gulanê jî, bi vî rengî mora xwe li dîrokê daye û jiyan li devê xwînijîye deraniye.

## Ferhengok

**ajdan:** zîldan  
**avahî:** bîna  
**awarte:** îstîsna  
**belam:** lê belê  
**bermayî:** kalintî  
**civaknas:** sosyolog  
**çavdîri:** gözlem  
**danexwe:** hewldan  
**derfet:** imkan  
**dexisîn:** hesidîn  
(kîskamma)  
**doman:** pêvajo  
(sürec)  
**domdarî:** berdewamî  
**fîrmesk:** hêstir,  
rondik  
**gerdûnî:** evrensel  
**gewşîn:** taybetmendî  
(özellik)  
**girse:** cemawer (kitle)  
**guncaw:** lêhâtî  
**helwestgirtin:** tavır  
alma  
**hemdemî:** asrî  
(çağdaş)  
**hêma:** nîma (imge)  
**karesatfiroşî:** felaket  
tellalığı  
**kariger:** faal, etkin  
**karigerî:** bandor, tesir  
kêlik: bi mecazi hedef  
**komicivîn:** kongre  
**awaz:** qels, jar  
**lewre:** lewma, ji ber  
**mafî çarenfûsî:** mafî

tayinkirina qedera  
xwe  
**mindal:** zarok, gede  
**mişt:** tijî  
**moristan:** cihê gêrik  
û moriyan  
**nehêni:** illegal, veşarı  
**nîjadperest:**  
regezperest  
**nişmî:** titiz  
**niştecîh:** bicihûyî  
**parzemîn:** qita  
**peykertraş:** heykel-  
traş  
**raberkirin:**  
pêşkeshkirin  
**resen:** xwerû, orijinal  
**rewa:** meşrû  
**rokirin:** valakirin  
**rûdan:** bûyer, qewmîn  
**siruştî:** xwezayî  
(doğal)  
**sergîhayîkirin:**  
temamkirin  
**şarîstanî:** medeniyet  
**tendurist:** sağılı  
**vîn:** irade  
**wate:** veyahût; mene  
**xefkirin:** veşartin  
**xeternak:** tîrsnak  
(tehlikeli)  
**xîroşî:** peroşî telas  
**xwoperest:** egoist  
(bencil)  
**zanyarî:** agahî

*Serokê Baroya Stenbolê Yücel Sayman:*

# Çete di ser hikûmetê re ne

## Gel cenaze hilanî

L i Kağıthaneya bi ser Stenbolê ve roja 4'ê gulanê 2 ciwanên kurd ên bi navê Bilal Vural û Hakim Atik, ku endamên HADEP'ê bûn, li ber şaxa Komeleya Ülkücüyan ya Seyrantepeyê, ji aliyê kesen ku endamê vê komeleyê bûn ve hatin kuştin. Bilal Vural di heman rojê de jiyanâ xwe ji dest da. Hakim Atik jî, pişti ku 15 rojan li nexweşxaneyê di bin tediwiya hûrbînî (yoğun bakım) de ma, roja 17 gulanê jiyanâ xwe ji dest da. Li aliyê din hate ragihandin ku, ew çekên ku bi wan her du ciwanên kurd hatine kuştin, yên Kevneserokê Komeleya Ülkücüyan yên Seyrantepeyê Nazif Küçük in. Bi pey van agahian Küçük, heman rojê seri li Qereqola Seyrantepeyê dide û dibêje: "Çekên min winda bûne." Peyre ew, radihêjê çekên xwe û ji qereqolê derdikeve.

Roja 18'ê gulanê endamên Partiya Demokrasiya Gel HADEP'ê, xwestin termê Hakim Atik ji termgehê (morg) hilgirin û binax bikin lê polisan nehişt ku HADEP'î cenazeyê Atik hilînin. Li ser vê yekê li ber deriyê Nexweşxane ya Çapayê polisan êris bir ser endam û piştgîrên HADEP'ê û malbata Hakim Atik. Pişti êrisê, polisan nêzîkî 20 kesî xistin binçavan.

Her wiha ji bo ku merasîma hilanîna Hakim Atik çenebe, polisan cenaze revand Taxa Sanayîye ya bi ser Kağıthane ve, lê girseya gel, li ser gorê, cenaze ji destê polisan girt û bi slogan û îlîandinê vesart. Di heman saetê de li ber avahîya HADEP'a Kağıthaneyê ji nêzîkî hezar kes civiyan. Bi qasî saeteke li ber avahîya slogan qîriyan, stran û helbest xwendin. Pişti ragihandina rîveberen Navenda HADEP'a Stenbolê girseyê berê xwe da goristanê. Girse nêzîkî çar kilometreyan meşîya. Di wê navberê de, polisan sê çar caran hewl dane xwe ku êrisi girseyê bikin. Lê li ber berxwedana girseyê polisan xwe dane ali. Lê di riya Dereyolu de polisan pêşîya girseyê girt û ji wir kom bi kom girse li erebeyan siwar kirin û girse di bin çavdêriya polisan de gihîst goristanê.

Di vê navberê de girseya li goristane, girseya ku vegeviya, bi alên ERNK'ê pêşwazi kir. Li ser vê yekê gel sloganen weki "Şehîd Namirin!", "Biji Serok Apo!", "Kurdistan wê ji faşizmê re bibe goristan!" qîriyan. Li diji vê helwestê polisan derûdora girseye girt û xwestin ku êrisi ser girseye bikin. Lê pişti ku Serokê Navenda HADEP'a Stenbolê Mahmut Şakar axaftinek kir û ji girseye daxwaz kir ku, bi awayekî bêdeng belav bibin. Li ser vê yekê girse belav bû.



Gel alen ku li ser gora Hakim Atik haşin vekirin bi dilxweşî pêşwazî kir.

## Yücel Sayman: Tirkîye ne dewleteke hiqûqî ye

Serokê Baroya Stenbolê Yücel Sayman jî, li ser heman bûyeran pirsên me bersivandin. Sayman, di daxuyaniya xwe de li ser ifadeya Şemdin Sakîk râwestiya û diyar kir ku, ifadeyan Şemdin Sakîk berî ku haya dozgeran ji bibe, ji rojnameyan re hatine ragihandin û rojnameyan jî ev agahî weşandin. Serokê Baroya Stenbolê Sayman dadi-xuyine ku, problemen ku pêwîst e veşarî bimînîn, bi riya çapemeniyê têr ragihandin. Ew vê yekê wekî tiştekî li derveyî hiqûqî bi nav dike û gazincen xwe ji vê yekê dike. Parêzer Sayman dide zanîn ku ev agahî têr weşandin, lê dewlet bi ser wan de naçe. Yücel Sayman dide xuyakirin ku, Tirkîye ne dewleteke hiqûqî ye. Ew, sedema lê-nepirsin û helwestnegirtina raya giştî ji wiha rave dike: "Girtina berpirsên wan bûyeran hem ji héza emniyetê hem jî ji héza hikûmetê der e. Lewre ew nikarin bi ser de biçin." Yücel Sayman bi bîr dixe ku Akin Birdal bi tenê ji van ifadeyan xesar nedîtiye, her wiha jî gelek rojnameger ji kar hatine avêtin. Bi baweriya wî, ev jî nîşan dide ku, ew çete-yen ku di nav Susurlukê de bûn, niha jî di nav saziyên dewletê de xwedî raye ne û bîryaran digirin.

## Ev destpêk e, wê ev êris bidomin

Serokê HADEP'a Enqereyê Kemal Bülbul jî suîkast li dijî Akin Birdal û pêvajoya ku bi van êrisan dest pê kiriye, ji bo rojnameya me nirxand. Kemal Bülbul suîkasta Akin Birdal bi misyonâ wî ve têkildar dibîne.

Ew bi bîr dixe ku, Akin Birdal însanekî astixwaz û di warê kîşeyâ kurd de xwedî nîrinên geleki awarte ye. Kemal Bülbul êrisen li ser HADEP'ê jî, par-

çeyek ji suîkasta Akin Birdal dibîne. Serokê HADEP'a Enqereyê Bülbul di de zanîn ku, dewlet bi awayekî siyasi bi ser wan de diçe û gotinê xwe wiha didomîne: "Dewlet naxwaze ku HADEP di nav hêzên demokrasîwaz de cih bigire û bibe hevkarê astixwazan. Lewre jî li ber xebatê me dibe asteng." Lê belê ew radigihîne ku, wê ew dîsa têkoşîna xwe ya meşrû bidomîn. Li aliyê din Kemal Bülbul van êrisan weki êrisen münerferît û şexsî nabîne. Bi dîtina wî, armanca van êrisan bêtêşir-kirina têkoşînê ye. Kemal Bülbul, bi taybetî balê dikişîne ser pêşerojê û di de zanîn ku ev rûdan berdewamkirina van êrisan destnîsan dîkin. Bülbul, di dirêjahiya axaftina de qala daxuyaniyê Serokwezirê Tirkîye Mesut Yilmaz yên li ser suîkasta Akin Birdal kir û wiha got: "Daxuyaniya Mesut Yilmaz, bûyera Apê Mûsa û bombekirina Özgür Ülkeyê tîne bîra mirov. Lewre wê rojê ji ji bo her bûyeran rayedarên dewletê gotibûn, tiştekî navxweyi ye."

Li aliyê din Bülbul di daxuyaniya xwe de bi awayekî xemgîn diyar dike ku, ew naxwaze karesatfirosiyê (fela-ket tellalığı) bike, lê belê bi baweriya wî, jiyanâ HADEP'î û İHD'yiyan di xetereye de ye. Ew dadixuyine ku ew helwesta xwe ya ehlaqî û civakî ya li hember van êrisan, li gorî jiyanâ şehîden xwe digirin.

Kemal Bülbul li ser pirseke me wiha bersiv da: "Rast e. Dewleta tirk xwe demokratik bi nav dike. Em bibêjin demokrat e. Di dewleteke demokrat dê, hêzên nehêni nîn in. Berî vêga ji bo ku timen taybet û JITEM ji holê bîn rakin, me pêşniyaz raber kir, lê hêzên demokrat jî di nav de kesî li me guhdarî nekir. Lê belê pişti ku Bûyera Susurlukê derket holê û têkiliya wê bi kîşeyâ kurd re ji nêzîk ve hate dîtin."

NAVENDA NÜÇEYAN

## Jİ MERASİMÎ AWAZEKE KURDISTANÎ DİFÜRIYA

Sate 02.30. Em li ber navçeya HADEP'ê ya Kağıthaneyê ne. Nêzîkî hezar HADEP'î li devê deriyê avahiya navçeyê sloganan dîbarînin. Li derdora wan ji wan zedetir polîs. Dîsa di her mitîng ango çalakiyeke protestoyî de, ew roboten zindî, kîncen ku bi diravên gelê mazlûm, ji Amerîkayê kirine, li xwe kirine û li hêviya fermana êrisê ne. Çend caran hewl dane xwe ku ew êris bikin. Lê belê girseya wê rojê, xwepêşandanen ku di salen 1990-93'yan de li Kurdistanê pêk dihatin, bi bîra me xistin. Girseyeke bi bîr û bawerî û berxwedêr. Wekî adetekê kaleki dilciwan, di nav girseye de rûnişt û bi dengeke zîz û dilsoj dest bi strîn kir.

Di wê demê de bêdengiyekê xwe li bajêr rapêça. Bi tenê dengê bêtelan dihate guhê me. Kameraman û wênekeş ji bo ku dîmenekê bigirin, li ser pişta hev siwar bûbûn. Pişti ku stran qediya, bi çepikê gur û dîsa bi sloganen "Şehîd Namirin!", "Biji Serok Apo!" tirs dixist dilê hemû kujer û dijiminên mirovahiyê. Pişti ku rîveberen HADEP'ê girse der barê cenaze de agahdar kirin, girse gelekî tenegez bû û berê xwe da ser gora Hakîm. Wekî gelek caran, ku yekem car em, dewletê cenaze revandibû. Girse nêzîkî 4 km. ji wê bilindahiya Çağlayanen bi slogan û çepikan dakete xwara Kağıthaneyê. Ev meş bi dilê polisan nîn bû. Lewre ji rîveberen HADEP'ê re gotin: "Divê meş çenebe." Lê belê girseye bi berxwedêriya xwe, li polisan guhdarî nekir, bi rî ket û xwepêşandanen Kurdistanî, bi awazeke kurdewarî li dar xist.

Wekî ku em kêm hindik di her xwepêşandanen de lê rast tê, dîsa alen ERNK'ê vebûn û gel pê şâ bû. Polisan xwe hilkişandin jorê û derûdora girseye pêçandin. Me jî li rajê makîneyen xwe siwarkirin û em li benda êrisê sekîn. Berê hemû nûçegihanen li alen ku hatine vekirin bû. Em jî di dilê xwe de dibêjin: "Ha êris kirin, ha dikirin." Belê vê carê êris pêk nehat û çapemeniya rengîn ji nûçeyekî ku kesan hedef bide nîşandayîn, bêpar ma.

AZAD ALTUN

*Civaknasê ereb Kemal Mehfûzê Misirî:*

# Serxwebûna kurdan mafekî surîstî ye

**H**ün bi çavê civaknasekî dikarin hînek agahiyan ji civata kurd dibin me?

Di domana jiyanê de derfet bi dest bi min ketin ku ez xwe bigihînim gelek kurdan. Di rojêñ borî de dostaniyeke germ di navbera min û wan hate pevxistin. Ji vê yekê ez kurdan bi rewşa wan a taybet, bi nirx, raman û çanda wan nas dikim. Hem ez xwe wekî civaknasekî kurd jî dibînim. Ez vê reqs û govenda wan a ku li dora dikê dizivire, ew a ku domdariya jiyanê nîşan dide jî dinasim. Ez birek deng û awazên wan jî dinasim. Bi awayekî giştî tê gotin ku bi tenê ew kesen ku li deştan niştecih in, ew in xudanê şaristaniyê. Lî bi rastî gelê kurd di bilindkirina şaristaniyê ji deştan ber bi çiyan ve bi ser ketine û bi vê şarezbûna xwe em şâşwaz hiştine. Kurd yek ji wan gelên kevnaretirin gelên Rojhîlat e, lê dîsa yek ji kêm gelên cîhanê ye ku heta niha mafê wî yê neteweyî û mirovahî nehatiye pejirandin.

*Bi dîtina we tiştîn ku li ber kurdan dibin asteng da ku ew mafê çarenûsiyê yê bi dest bixin ci ne?*

✓ Mirov dikare bibêje ku di serî de tiştî ku dibe asteng bi tenê bextreşîyeke siyasî û civakî ye. Dema em bala xwe bidin birek serhildanê ku li cîhanê pêk hatine, emê bibînin ku bextreşîya herî mezin a neteweya kurd e. Lewre dema ku em li rewşa serhildana alewiyan dînihîrin, ya bi navê Muhammed Elî Paşa û bi nusbet ku ev serhildan li welatê Misirê ye û di destpêka sedsala 19'an de ye û serhildana gelê Albani tu demê bi hev re nayêñ rûberkirin. Lewre serhildanê parzemînan her yek ji wan bi rewşa xwe ye. Yanê ew ci ye ku ji bo împeryalîzma cîhanê û mêtîngîriyê re bi kîr be, ew cih serhildanê li wî cihî pir bi çetinayî derbas dibin. Yanî serhildana gelê Albani li gorî ya elewiyê li Misirê bi hêsanî derbas dibe û bi ser dikeve. Ji ber sedemîn xwe yêñ stratejiya herêmî. Lî kurd ji birek hêlan ve têne lêdanê. Ji ber ku qada axa kurdan ketiye nava parzemîneke wisa ku, di pirîn demêñ dîrokî de li ser wê neverê mijara mafêñ mirovan û mafêñ demokrasîya ji kesan re rola xwe nelîstiye. Hem jî yek ji bextreşîya kurdan ew e ku doza wan a neteweyî ketiye destpêka ramanê ku di cîhanê de ketine pêsiya ramana gelbûna gelan û pirsgirêka wan a gelerî. Wekî çawa ku niha di pêsiya her tiştî de cîhana ku dibêje em hemdem û nûjen in, dixwaze yekîtiya neteweyan û yekîtiya bazirganiya wan bi hev re ava bike. Bextreşîyeke ji bo axa kurdan ev e ku Kurdistan ketiye nava dilê xezîneya petrolê. A ji bo vê sedemî, her dagirkir naxwaze dest ji dagirkir û mêtîngîriyâ xwe ya li ser vî welatî berde. Bextreşîyeke kurdan jî, jihevdeketin û jihevbela vbûna împaratora os-

maniyan e. Lewre dema ku pirê axa cîhanê ereban, ji bandora vê împaratorê hate rizgarikirin, kesen ji bermayiyêñ vê împaratorê û nîjadperesten tûranî nexwestin ku êdî pir windakirin bêwar di cîhanê de bimînin, destê xwe, çavê xwe li ser axa kurdan sidandin.

*Tê gotinê ku pirsgirêka kurdan digel erebên Iraqê bi hêsanî dê were çareserkerin. Lî li cem Îran û tîrkan çareserkerina pirsgirêkê dijwar e. Gelo dîtina we di vî warî de ci ye?*

✓ Ez li ser vê dîtina xwe dimînin, yanî girêdana kurdan bi ereban dewrêñ wê yêñ dîrokî hene. Wekî ku ez bibêjîm kurd bi ereban re bi hêsanî dikarin li hev bêñ û bi hev re bijîn. Lî li hêla dewleta ïranî ez nikarim bibêjîm wê bi hêsanî û bi mirovahî bi kurdan re li hev bêñ û mafêñ wan bipejîrinin. Nemaze dewleta ïran a bi navê îslamê jî xwe nade ber mafêñ neteweyî û mirovahî ji bona kur-

xwest wan di nava gelê xwe de veheline û bixe tirk. Dîsa dest bi koçkirina gelê kurd kir û ew ji welat û warê wî dûr xist û ew kuşt û talan kir. Çawa ku bi devê Serokomarê Tîrkiyeyê Süleyman Demirel hatiye gotin ku dewleta tirk di nava demen 13 salen ser de 37 hezar kurd kuştine. Ev daxuyaniya wî di 28/12/1987 de hate weşandinê. Lî Kurdistan digel van mesten xirab jî dîsa bi berxwedana zarokên xwe li ser piyan ma. Hem jî bû kelem û asteng li pêsiya yekîtiya Tîrkiyeyê bi welatên Ewrûpayê re. Ji bo van mebest û tevgeren wan ên xirab mirov dixwaze gotina li ser diwarrê avahiya UNESCO'ye hatiye kolanê bi bîra wan bixe: "Di êqil de ser û ceng diwelide, dîsa di wî de astî jî diwelide."

Di pêlîn demen cîhanê de mirov dibine ku giz û girêdaneke kurdan bi ereban re heye. Di cur bi cur demen jiyanê de wekî çawa ku em bêjin: Giza wan a bi ereban re di warê çandî û wêjeyî de, ji

waz divê bi hev re hefteyen li ser navê çanda kurdî çêkin. Hem jî em digel kesen kurd dikarin wan hunermendê muzika kurdî û şanogerên wan û listikvanen wan ên ku gelê ereb wan nas dike û ji wan hez dike derxe û bide nasin. Wekî niha filmê bi navê "Yol" bidine listin û bi gelê ereb jî bidine nasandin. Bi vî awayî em kesen hunermend û zana dikarin bibine alîkar û pirsgirêka gelê kurd ji cîhanê re diyar bikin.

*Gotina we ya dawî ci ye?*

✓ Pêwîst e hunermend û zanyar di nava tevgera kurdî de rola xwe bilizin û tevgerê zexim bikin. Ew jî her bi girêdana hunermend bi civakê ve tê bi destxistinê. Yanî li ser her hunermendekî e kurd ferz e ku hunera xwe ji bo gelê xwe bixebitîne.

Hem jî her wisa divê ku hunermend çawa hunera xwe ji bo gel dixebitîne, wisa jî ji bo aboriya tevgera rizgariyê bixebitîne. Lewre stratejiya tevgera rizgariya gelê kurd li ser van herdû xalan e; yek civak a din jî aborî.

Xaleke girîng jî ev e; ji bo pêşveçûna tevgerê pir girîng e ku tevgeren rizgariyê neteweyî bi serê xwe bin. Lewre di demen borî de, pir mînakîn feşîlandinê tevgeren kurdî çebûne. Ew jî ji ber girêdana tevgeran bi hînek dewleten deverî an yêñ împeryalist re bûye. Wekî tevgera Mehabadê. Lewre wan hêzên ku tevgeren rizgarî yêñ neteweyî dixin bin bandora xwe, ew ji bo berjewendiyê xwe wan tevgeran bi kar tînîn.

Kesê ku dost û dilxwaz in ji bona doza gelê kurd, vê rewşê naxwazin. Bi van ramanan ez dikarim bibêjîm di cîhanê de çiqas rewşenbîr û hunermend û kesen xwenas û zana hene, dilxwaz û piştevan in ji bo tevgera rizgariya kurdan. Ez wekî insanekî rewşenbîr dibînim ku, damezirandina dewleteke kurd li beşa Iraqê girêdaneke pir mezin di navbera xwe û cîhana ereban de dikare bide avakirin. Her wiha ev dewleta Başûr ya federalî, bi besen mezin ên Kurdistanê re jî bi peywendiyê federalî dikare bêhtir bi cîhana ereban re xebata xwe bi pêş ve bibe.

dan. Di pêsiya de çawa ku me got di demen dîrokî de hetanî vê demê li ser vê herêmê mafêñ gelan yêñ demokrasî û mirovahî nehatine xebitandin û pejirandin. Her wisa desthilatdarêñ vê neverê mafêñ gelan ên neteweyî jî bi hêsanî na-pejîrinin. Lî pirsgirêka kurdan ji hêla dewleta Tîrkiyeyê, jixwe diyar e. Lewre ji mîj ve rejîma tûranî an jî ya kemalî bi her reng û rewşî gelê kurd xapandiye û di binê destê xwe de hiştîye.

Cawa ku di 26/05/1919'an de, bingeha Kemalîzma iro hate avhetin. Li ser biryaren Komcivîna Erziromê diviyabû kurd jî wekî tîrkan xudanê wê komarê bûna. Lî di piştî avakirina komarê re, pêşî êrîşî ser kesen bawermend kir. Di dûv re êrîşî ser kesen ne tirk kir. Bi vî awayî mafêñ ku di Peymana Sewrê de ji gelê kurd re hatibû naskirinê bi Peymana Lozanê re desteser kir. Lewre di Peymana Sewrê de mafê damezrandina dewletekî kurdi hatibû naskirin. Ji wê rojê de dest bi inkara gelê kurd kir û got: "Her kesê di vî welatî de tîr in. Kurd jî tîrken ciyayî ne."

Belê bi rastî ji bo çareserkerina pirsgirêka kurd divê hunermend û çandyar werin cem hev û bi hev re çalakiyan li dar bixin, daxuyaniyê çapemeniyê bidin û hem jî kesen hunermendê astîx-

**Damezirandina**  
**dewleteke kurd li beşa Iraqê girêdaneke pir mezin di navbera xwe û cîhana ereban de dikare bide avakirin.**  
**Her wiha ev dewleta Başûr ya federalî, bi besen mezin**  
**en Kurdistanê re jî bi peywendiyê federalî dikare bêhtir bi cîhana ereban re xebata xwe bi pêş ve bibe.**

*Gelo hunermend û civaknasen kurdan û ereban çiqas dikarin rola xwe der barê çareserkerina pirsgirêka kurdan de bilizin?*

✓ Kesen ku hunermendê çand û wêjeyâ gelan in, dikarin rola xwe ya mirovahî û hunerî der barê mijarîn ji bo mafêñ kesen di cîhanê de bilizin û bibin alîkar û çareserkeriya wan pirsgirêkan. Tê dîtinê gelek kes mafê serbixwetiya gelê kurd na-pejîrinin. Ev jî ixanetek e ku bi destpêka heyina gelan re tîr in. Lewre dema ku gelek hebû, mafê wî pê re ye.

Belê bi rastî ji bo çareserkerina pirsgirêka kurd divê hunermend û çandyar werin cem hev û bi hev re çalakiyan li dar bixin, daxuyaniyê çapemeniyê bidin û hem jî kesen hunermendê astîx-

*Têbinî: Ev hevpeyvin ji kovara Sorgul ku li Berûdê bi erebî derdiye, hatiye wergirtin.*

Ji erebî werger: CELALETİN YÖYLER

Dest bi asimîlasyona kurdan kir û

# Rêzimanê kurmancî

- Wane 12 -

SAMÎ BERBANG

## Cînavkên berbihevîn

Cînavkên berbihevîn ji aliyê Celadet Bedirxan ve di bin sernamekî cûda de hatine ravekîrin, lê Murad Ciwan û Reşîdê Kurd, wan jî di nava cînavkên kesane de dihesibînin. Bi dîtina me wisa guncawtir e. Ev cure cînavk du heb in: hev û êk.

Cînavkên "êk" bi tenê li hêrema nîvrojhilate Kurdistanê tê bikaranîn. Li herêmê din ên Kurdistanê "hev" tê bikaranîn. Ev cure cînavk pir kesan bi hev re dinimîne. Her wekî çawa ku cînavka /-ê/ bi tenê kesê yekjimar dinimîne, bi tu awayî nikare kesen pirjimar binimîne, ew jî nikare kesê yekjimar binimîne. Wate, dema yekî got: "Em birayê hev in" an jî got: "Em birayê êk in.", tê zanîn ku, ez birayê wî me, ew jî birayê min e.

Li vê derê pêwîst e, ku mirov çend têbîniyan li ser binyata wan cînavkan bibêje. Ji wan cînavkan "êk" hêr wekî diyar e, ji hejmara me ya "yek" hatiye. Di

nava hevokê de ew bi awayê "êk û du", "êk û din" û "êk û dî" jî derdikeve pêşberî mirov. Diyar e ku, ew peyvîn "du, din, dî" jî têkildarî hejmara "du" ne. Li gorî daxuyandina Celadet Bedirxan cînavka "hev" jî ji hejmara "jew, yew" a kirmancî (dimili) hatiye. Ev ravekirin ne dûrî aqîsan e, lewre di zimanê din de jî ev cînavk berambarî heman hejmaran hatiye bikaranîn. Bo nimûne di îngilizî de "each-other" jî di wateya "êk û du" de ye.

Piştî wan têbîniyan, mirov dikare bi çend mînakan dawî li vê mijarê bîne:

Me li hev nihêri, lê me hev û din nas nekir.

Em pismamê êk û du (hev û din) in.

Ew birayê hev in.

Wan li hev xistiye.

Ew bi hev û din re çûne mal.

Kes li rewşa hev napirse.

Em xwişk û birayê êk in.

## Cînavkên lihevxistî

Ev cure cînavk, cînavkên he-

vedudanî ne û ji du hêmanan pêk hatine. Ji bo ku mirov vê mijarê zelal bike, pêwîst e mirov hinekî li ser daçekan raweste. Daçek ew tişt e ku di nava hevokê de bi serê xwe tu wateyê nadî, lê hevokê ji hin alîyan de sergihayî dike. Di kurdî de daçekên bingehîn ev in: "Li, ji, di...de, bi". Her wekî ji mînaka "di...de" jî xuya dike, hinek ji wan daçekan bi paşdaçek in, wekî "bi... re, ji... re, bi...ve, ji...ve". Pêşdaçeka "di" bêyî paşdaçeka "de" nayê bikaranîn, lê yên din bêyî pêşdaçek ji dibin.

Ev daçekên navborî bi cînavkên wî/wê (li gorî Reşîdê Kurd ev cînavka /-ê/ ye) ve digihêjin hev û cînavkên lihevxistî derdikevin holê.

Ji û wî/wê dibe jê

Di û wî/wê dibe tê

Bi û wî/wê dibe pê

Li û wî/wê dibe lê

Di daçekên ku paşdaçeka wan heye de, paşdaçek wekî xwe dimîne û dîsa wekî berê tê dawiya pêşdaçekê. Yanê "ji

wî/wê re" dibe "jê re", "di wê de" dibe "tê de", "bi wî/wê ve" dibe "pê ve" û hwd.

Dema yek bibêje: "Te li wî nihêri?" tu dikarî bibêjî: "Belê min lê nihêri." Pêwîst nake ku tu careke din bibêjî: "Min li wî nihêri." Mirov dikare bi çend mînakan mijarê zelaltir bike: Min ji Elî re got/ Min ji wî re got/ Min jê re got Ez li wir rûniştîm/ Ez lê rûniştîm

Ew ji gund hat? Belê ew jê hat. Te ji wî re pênusek anî? Belê. Min jê re anî.

Te di mal de kes dît? Erê. Min tê de mirovki rihdirej dît.

Tu bi wî re peyivî? Erê. Ez pê re peyivîm.


Te ji wî re nan anî? Erê. Min jê re anî.

Ev cure cînavk bi tenê cihê kesen seyemîn ên yekjimar digirin. Bi tu hawî nikarin bikevin cihê kesen sêyemîn ên pirjimar "wan".

Yanê gava yek bibêje: "Te ji wan re got?" Mirov nikare bibêje: "Min jê re got." Divê mirov bibêje: "Min ji wan re got."

## Ji wêjenasiya Mela re şîroveyeke felsefi

CELALETTİN YÖYLER



Bî rastî gava ku mirov bi çavekî vekirî, bi dil û mîjîyekî paqîj û amade, li beytîn Mela (Meleyê Cizîrî) dînihêre, mirov dibîne, ku Mela di beytîn xwe de, teşbîh, kinayet û mecazê, bi awayekî felsefi dixebeitîne.

Bi vî awayî, em dikarin bibêjin, naveroka beytîn Mela, bi rewşeyeke elastîkî, hem zanistî hem jî felsefi ne. Gava ku em dibînin: Mela di beytî de, qala Dîlberê dike, em bi rewşaye elastîkîya beytî dikarin bibêjin, armanc û mebesta Mela ji Dîlberê, kesayetiyeke mirovahî û rîbertîyeke qenc e. Yanî Mela di serê xwe de, di raman û ponijandina xwe de, navê wê keseyatiya ramanî, datîne "Dîlber şahîd û yar". Bi kurtayî Mela navê hêza qencyê û mirovahîye, datîne 'Dîlber' an tiştekî din. Wekî çawa di baweriya Zerdeşîyan de, navê afîrînerê qencyê datînin Hurmuz. Yê şer jî datînin 'Ehrîmen'. Çawa ku bi awayekî zanistî, armanc ne qencya ji peykerê Hurmuz e ne jî xirabiya ji peykerê Ehremen e. Ev her du peyker bi tenê sembolîn herdu ramanan in.

Lê bi rastî estefîkî û elastîkîya beytîn Mela û li pey hev rîzkirina wan peyv û bêjeyê bedew, mirovan dikişînin nava deryayeke ji hêla wateyê ve hûr û kûr. Em werin ser bedewiya wan beytan û hinekan ji wan li vir wekî nimûne rîz bikin:

Cama di destê Şahîd, jengê ji dil disotin Pîrê muxan, ji rendan, weh weh dikir rîwayet.

Mela dibêje: Qedeха meyê û piyaleya di destê şahîdê (Dîlberê) de, yanî vexwarina ji wê meyê, jeng û qirêjîyê ji dilê me şûştin. Dema pê ve datîne û dibêje: "Pîrê muxan" yanî mezin û serkarê zarokêni meyxaneyê dê, ji sermestî û serxweşbûna wan kesê ku di meyxaneyê de bi meya evînê mest bûne dipeive û wan dipesnîne. Hem jî bi sedan pesindayîn û riwayetan qala wan dike. Em dikarin bêjîn ku armanca Mela ji Şahîdê rîberiya mirovahîye. Armanc ji meymestiyê jî evîndariya herî mezin a mirovahî xwenaskirîne ye. Dîsa jî em girêdahiya bi vê beytî ve beytekî din jî bînîn û li ser raz û wateyê estefîkî rawestin:

Etarê eşp û mest i, esrarê pûperest i Teqrîre sed riwayet, nakit ji bo kifayet

Mela di vê beyta xwe de dibêje: Ketic û rabûna di nava pêlén evîndariyê de û radeyîn wî yê nizim û bilind de hem jî razen di nava pûperestiyê de, bi sedan gotin û riwayet têra wan nakin û ne bes in ji bona şîrovekirin û zelalkirina wan razan. Di beytî de Mela bi girîngî û balkêsi tevgera evîndariyê û bestiya di nava meya evînê û razen di nav evîna pû-

perest de, dipesnîne û dinirxîne. Hem jî dibêje; Bi sedan riwayet û lêkolîneren vê mijarê nikarin van razan binixînin û bipesinînin. Bi rastî Mela di vê ramana xwe ya di warê girîngîya ku dide evînê de, xudan maf e. Yanî heger ne bi sedan, em bi hezeran mînakan û riwayetan di derbarê evînê de rîz bikin jî, dîsa emê bêhêz bîmînîn û emê nikarîbin xwe bigîhînin xalêñ wî yê hûr û kûr.

Em werin ser estefîkî û elastiyaka wateyên, felsefi ya beytîn Mela yêñ'ku di warê elastikê de dibine neynika evîna şoreşgerî payebilind a bêhempa ya têkoşîna gelê kurd. Gavâ em bi hev re di nava watedariya wêjenasiya Mela de li lehengîya şoreşgerîn xwe temaşe dîkin, em dibînin ku qîza şoreşger a herdem a leheng cangoři di dirûvê dîlberekê de bi reng û reng bedewiyê siruştî xemîlandiye. Ew ji bo vê evînê bi meya ramanen şoreşgerî û mirovahîye sermest û serxweş dibe. Lê qedeха wê meya zelal a zanista felsefi ya mirovahîye, ji destê mamosteyê bêhempa yê şoreşâ nûjen vedixwe û mest dibe.

A ev qîza şoreşger a di nava çar dîwarê girtîgeha dagirkeren bêwicdan de, wekî wan xwişk û birayê xwe yêñ' leheng ên berî xwe, dixweze xwe cangoři bike, ji bo wê evîna xwe bilind bîbe wekî navê xwe yê (Seima) ber bi semayê here.

A ji bo vê girîngîya vê evînê Mela dibêje: Teqrîre sed riwayet, nakit ji bo kifayet.

# Ti biya astarik û Kurdistan de akewta,

## Embazza Gurbetelli Ersöz

**A**miyanê Ko Spî de dewa şaris-tanê Paloy Zîver de, sera 1965 de maya xo ra biya. Çend serî têpya qeçikiya xo de ebi malbatâ xo ya yena şarîstanê Çukurovay Adna. Keyneka dewa Zîver Gurbet, werdikina xo peyra welatê şarî de, la belê ebi hes-retê Ko Spî ya bena gird. Ay dibistanê sıfeyin, werte, peynî û zankey Adna de wend. Peyniya wendinê xo dê, Zankeya Çukurova de kîmyay sero karê xo yê akademik ardê ca. La belê ay, qandê xeftiyayinê şoreşê şarê xo, xebatê zanekarîn nîme de verada û kewt lecê reynayinê şarê xo miyan. Nê qerarı girotina ci de, emegê Şehîd Hasan Çürükkaya yî zaf vêşî esto. Çimki ay, Şehîd Hesenî ra zaf hez kerdê. Coka jî a rew kewtê fîk û waştinê ci bin.

Wexto ke Hesen şî a jî eya piya şî parti miyan. Şehîd Hesen Bakurê Kurdistan de, a jî Başûrê Kurdistan de ebi gulanê xayinanîn şehîd kewt. Embazza Hesen ebi gulanê korucuyana, embaza Gurbet jî ebi gulanê peşmergeyê PDK ya şehîd kewt.

Ma piya Özgür Gündem de, hindê di serî xeftiyayî. Ma xeylê çî piya ravêr-nayî û nezdî ra pê silasnayî. Ez şena vajî ke, rojîn ma zaf rind û zelal piya ravêrdî. Kes nêşeno heme çî nûstînên wina kilm de biyaro ziwan, la belê ez şena qandê ay wina vajî: "A zanekarê enê şoreşî, entelektüel û merdim heza şarê Kurdistanî bî." A finê zey qeçekî biyê werdî û finê jî zey dapîrê biyê giran û hera. Girdiya biyê gird, werdiya biyê werdî. Rew rew kes ci ra nê-iciziyâ û ci ra mird nêbiyê. Qandê embazanê xo çiçî ke, ci dest ra ameyê qe texsîr nêkerdê. Kişî ra zerîtenik bî û kişî ra jî zaf metîn bî. Goreyê wext û rewşî, xo şirêgnayê. Zewbî jî embaza Gurbet weşîna xo de, xo babetna da silasnayin. A vinderdina xo de, wayirê huner bî, çimki tayn xusîsetê ke ay de estbî, kesî de çinêbî. Zek ma vajî embazanê xo ser de zaf lerzayê û zaf qîmet dayê embazanê xo.

Kontrayan embaza ma Aysel Malkaç remnê û fina jî, ci ra xeber nêvejiyê. È rojan de berpirsyarê roj-namey embaza Gurbet bî. Qandê diyina embaza Aysel, ma mengê kewtîm grevê veşyanîn. Tirkîye de, teberdê Tirkîye de, ma ca nêverada ke, serê nêdabi piro. La belê qe cayê de jî xeber nêvejiyê. Embaza ma wa delal pay ra vinî bî. Embaza Gurbet qandê Aysel, sük bi sük, mezel bi mezel, morg bi morg geyrayê. Kotî de jew meyit vînyayê, Gurbet şiyê ci sero û ewnayê



ci ra ke Aysel a, Aysel niya. A şew û roj Aysel peynî de geyrê û şop zaf ramit, la belê Aysel ra vengê nêvejiya. Embaza Gurbet, è rojan de diyin û hêviyên xo wina ardê ziwan: "Wa şopê Aysel ra çiyê ma dest kewtayê, wa hindê misqalê biyayê. Na dewlet, gurwê xo zaf weş ana ca û herûnde qe çiyê jî nêveradana. Arjantîn, Şîli û Tirkîya, cenêtê vinibiyayinê şoreşgeran ê. Ez Aysel hewn de vînena ke ma ra hetkarîn wazena û ma jî nêşenê çiyê jî bikerê. Embaza ma dewleta tirk remnê û kişî, na xusûset de, mîjgê ma de qe guman û pers çiniya. La belê şop nêşina kêberî ver. Ez dişmenî ra mer-hemet nêpawena, la belê rûmetê dişmenatey jî esta. Peyniya ney gurwî yo nêyero, çirê ke dişmenê ma bêna-mus o û bêwîjdan o." Wexto ke ay Aysel ardê vîra xo, kewtê kizilma vinibiyayina ci.

Embazza Gurbeta, mi jû şew ravêrnê, a şew wa qe min vîra nêşina. Qandê pêserameyinê buroy û nûştoxê roj-

namey şîbi Enqere. Jew embazî ci rî faksê rişeno û na faks de wina vano: "Birayê to Doxtor Orhanî, Qûlp de jew lecê gerflay miyan de şehîd kewto. Wa xebera to bibo." Embaza Gurbet senî ke na faks wanena, kewna ray û yena Stenbol. Xeberê min çiyê ra çinê bi. Min ewna ke Gurbet şan de, finê ra amê roj-namey û min rî vat: "Bê ma şirê keye." Min Orhan jî, a jî verî ra silasnayê, cokra mabênenê ma zaf weşbi. Ma kewtîm ray û şîm keye. Keye de jî bê min kes çinêbi. A şew şan ra hetanî şefaq, ma piya bêveng ronişfîm. Zaf çî çimanê min vera ravêrdbi. Ez winî bawer kena ke ay jî weşîna embaz Orhanî sere ra hetanî peynî ard çimanê xo ver. La belê qe weneyê jî nêard ziwan. Çimki weşîna raşt vernî de, vatenî bîbî bêmahne. Zewbî jî ma nêwaştbî pê bixapeynê û qisanê zûriya qiwet bidê pê. Çimki Orhan, çend mengî verî şîbi gerflay û raşt jî şehîd kewtbi. Ma hurdna jî rind zanayê ke ena biyayina yena çi mahna. Bi şew ra

ma cayê xo de weriştî ke şirê roj-namey, ay no fin wina vat: "Embaz Orhan, şehîd kewt. Weşer bo to rî Orhanî min, şorgesgerê Kurdistan!"

Rojê mafê mardiman, 10'ê berfan-barê 1993'în de dewleta tirk, ebi var-dayina girdiya anciyê bûroyanê ma ser. Na vardayin de nezdîyê se embazî ma girotyay binçim. La belê rojo bîn, bê 17 embazî ma pêriko jî viradyayı. Embaza Gurbet jî, è des û hewt embazan miyan de bî. Wexto ke a binçim de bî, min ay rî û Gultan rî çîna berdbi cayê işkencexaneyê Gayretepê. Ay, o roj min rî binçim ra notekê riştî. A not de, ay wina nûstbi: "Embaz ma xeber çapkerdina roj-namey girot. Na xeber ma rî bî teqet. Ney ra têpya mekewê qaxûyê ma, moralê ma zaf bi weş. Selam bo embazan rî." Wexto ke min a not wend, zek adir dekewo ganê min, winî zerya min bî germ. Ebi kîf û eşqa ez ageyra ya roj-namey. Ma embazê ke teber de jî, embazanê binçim ra, zafin ra jî Gurbet ra rûmet û qiwet girotbi. Wexto ke ma na xebera embazan resnê roj-namey, embazan ebi çepikanê xoya verpers da. Gurbet bahdoyê binçim şes mengî zîndan de mend û 16'ê tûrmeha 1994'în de vejyê.

Rojê min Erzirom ra, siyê Erziromî ra mûrekî ardibî. Gurbet nê mûrekî milê Evîna ma de dî. Min ewna ke vat: "Embaz to min rî jî nê mûrekan ra nêardî? Ti jî zanê ke ez mûrekan ra zaf hez kena. Eke to min rî nêardî, eza keyna şima ra nîna bigîrî." Min vat: "Wili embaz ez to ra raştî vaja, min to rî nêardî, la belê eke ti ya wazena ê Evîn bigî." Ma ewna ke embaz mûrekî milê Evîn ra vet û wina vat: "Eza kuşat nêkena. Nê mûrekî min ê." Çend rojî ê mûrekî milê ay de mendî. Bahdo jî, mûrekî fina day Evîn.

Embazza Gurbet weşîna zîndanî ra têpya, şî teberê welati. Başûrê Kurdistan de kişa werdî û gird de hindê hîrê serî gerflatey kerd. Gerfla miyan de xebatê çinîyan sero xeylê xeftiyê. Sera 1997'î de Başûrê Kurdistanî de jew vardayinê pêşmergeyanê PDK û leşkeranê Tirkana kewt lecî. Nê lecî de ebi çend embazanê xo yên nêweşî û dirbetiniyana şehîd kewt.

Embazza Gurbet, Ko Spî ra hetanî Zap û seranserê Kurdistanî de zey astarike qe hewna nêşiro û a wa tim û tim azmînê Kurdistanî de akewte bimano. Raya ma roşnî kiro. Wa weşer bo to rî, torina Kal Saidî.

□ 26 gulan 1927:

**Serhildana Motkan dest pê kir**

Dewleta tirk, pişti Serhildana Şêx Seîd, bi boneya ku careke din raperînên kurdan pêk neyên, dest datanî ser çekên kurdan. Li hemberî van kirinên dewletê, li herêma Motka û derderôn wê, 8 eşîrên li 35 gundan li dijî artêşa tirk bi hezaran çekdar anîn cem hev û dest bi operasyonan kirin. Di ser de serokê eşîran Şêx Evdiheman, Eliyê Ünis û Zekiyê Selîm birîndar bûn. Serhildanê heta 25'ê gelawêjê dom kir.

**BÜYERINE JI DİROKÊ**

□ 27 gulan 1979:

**Kovara Serxwebûn li Dîlûkê derket**

Ev kovar pir zêde derneçûye. Bi tenê çend hejmarênen wê yên taybet derçûne. Li gorî ifadeya hin kesen ku, bi ifdaya endamîta PKK'ê hatine girtin, hejmareyên taybet yên 1. 2. û 3'êñ kovara Serxwebûn li Dîlûkê (Entab) hatine çapkirin. Hejmara 4. jî li gundê Uluköyê ku li ser Tilermenê (Qoser) ye hatiye çapkirin. Piştire di sala 1983'yan de Serxwebûn li Ewrûpâye derketiliye.

# Peykertraşê kurd Nezîr Xeylanî Stockholm feth kir



**P**eykertraş Nezîr Xeylanî, ji başûrê kurdistanê ye. Demeke dirêj e ku bi çekirina peykeran dadikeve. Li Kurdistanê û li derveyî Kurdistanê gelek pêşengehê wî vebûn. Ew hunermendekî bi nav û deng e û endamê Yekîtiya Hunermendê Cihanê (IAA), Yekîtiya Komelâ Hunermendê Wêneyan li Norweçê û endamê Înstituya Kurdi ya li Stockholmê ye. Xeylanî, bi piştigiriya Înstituyê Kurdi ya li Stockholmê, berî niha bi demekê pêşengaheke nû saz kir. Pêşangehê pazdeh rojan dom kir. Di roja pêşî de, hejmarek mezin ji kurdan hatin eywana înstituyê û li berhemên wî temaşe kirin. Di roja sisîyan de jî, hejmarek mezin ji dezgehê hunerî yên xerib hatin serdana pêşangehê. Pêşangeh berî ku hefteya xwe dagire, bala gelek kesen hunermend û saziyên hunerî kışand. Me bi hunermend Nezîr Xeylanî re li ser huner û pêşangehê kurtehevpeyvînek pêk anî.


Nezîr Xeylanî, di sala 1953'an de li Şeqlewe ji dayik bûye. Pişti xwendina xwe ya navîn, di 8 saliya xwe de dest bi karê hunerî kir. Ev 30 sal in ku, ew bi karê peykertraşiyê radibe. Heta niha jî 3 hezari bêhtir peyker dirust kirine. Wî, yekemîn car li Silêmaniye pêşangeh vekiriye. Pişti wê tevî serê çekdarî bûye. Pişti sala 1988'an ku pêşangeha xwe li Şamê vedike, ew diçe derveyî Kurdistanê. Xeylanî, heta niha li dewletên cur bi cur 22 pêşangeh li dar xistine. Ji wan 22 pêşangehan, 9 heb li Iraq û Kurdistanê yên din jî li derveyî welêt hâtine raxistin. Sê pêşangeh yên taybetî li Suriyeyê vekiriye. Yen din jî 8 li Norweçê, yek li Danîmar-kayê û niha jî yek li Swêdê vekiriye. Her wilta Nezîr Xeylanî digel hunermendîn biyanî jî kar kiriye û li Ewrûpa, Asya û Amerikaya Latîni jî pêşangeh saz kirine. Peykertraşê kurd Xeylanî, di hemû

berhemên xwe de daran bi kar tîne. Lî wî, berê ji hestî, kevir, bazalt û mermer jî peyker durist kiri-ne. Hunermendê kurd Nezîr Xeylanî bi vê xebata xwe dixwaze trajediya kurdan û çanda wan bi hunera xwe nîşanî hemû cîhanê bide. Li gorî wî, kurd mîletekî zor kevnare ye û diroka peykertraşiyê jî di Kurdistanê de geleki kevn e. Lî çanda kurdan ji aliye ereb, faris û tirkân ve hatiye tâlankirin. Ew, armanca hunera xwe wiha diyar dike: "Eme dixwazin bi hunerî xo, cêgâyî xo di nav hunerî cîhanê de bigrin. Min dixwazim li ewa xwedî derkevîm û rastiya ew roj têxim nav hunerî xo û dixwazim mîraz bihêlim bo Kurdistanê."

Nezîr Xeylanî, li ser problemê peykertraşen Kurdistanê jî balê dikişîne ser bêrêxistiniya wan û pêwîsiya komeleyeke rasteqînî ya kurdan tîne ser zimên. Bi baweriya wî, ew dikarin bi riya wê komelê dengê hunermendê kurd bigîhîn hemû cîhanê. Dîsa bi pey agahîyen Xeylanî, Akademiya Kurdi ya li Almanyayê heta niha di warê peykertraşiyê de tu xebatên berbiçav pêk neanîne. Ew dibêje ku, "Ewe dizane, her pêşangehek mesref dixwaze. E me bi tenê nikarin kar û xebatî xo bidomînin. Pêwîsti bi piştigîrî heye."

Dawiyê de me der barê xebatên wî yên di pêşerojê de pirsek jê kir. Wî jî wiha bersiv da: "Ni-yazîm wa ye ku, li havînê bo mindalanî (zarok) kurd kursek hunerî vekim. Min bo Înstituyî Kurdi li Stockholmê ew pêşniyar kirim. Hêvîdar im ku pêşniyaza min bi cih bê. Ew niyaza kevin e. Min dixwest li Kurdistan bikim. Belam çenebû."

GABAR ÇIYAN/ STOCKHOLM

**ÇAVDÊRÎ****Salêن Salvegeran****MÎRHEM YİĞİIT**

**S**alvegeren me zêde dibin. Sê saliya MED TV, sêsalîya Parlamentoya Kurdistanê li Derveyî Welat (PKDW), heşte saliya kovara Jînê, nod saliya rojnameya Komela Hevkârî û Pêşketina Kurdistan (Kurd Teavûn û Terakkî Gazetesi), sedsaliya rojnamegeriya kurdî.

Salên me, meh bi meh bi manetir dibin. Her sala dibihure, bi awayekî didexise sala pişti xwe. Her sala tê, li salê berî xwe mezinâhiyekê zêde dike, jê re dibe saxlemî û qewîniyek, dibe garantî û demanek.

Em kurd, êdî ne bi awayê berê, belê bi reng û şiklekî din dijîn. Bi çavekî din dibînin û guhêne me jî jî yên bay û kalêne me ferq dîkin.

Jiyana cihê, têr û ji xwe re, xwebinûvekirina herâlî û bi hismendî, zemên ji biqedirtir dike.

Li welatê me, di nav kurdan de iro, zeman û çerxa felekê bi celebekî din digere. Duh û iro ev ger ne mîna hev e. iro pir bi leztir e û tu jî kîjan alî de lê binihîrî, mohra kurdan hildigire û şebleke kurdreng lê dixuye. Mîna ku kurdan jiyan bi qubale girtibe û heyfa hezar salan hilînin, mîna gêrikên moristanan, bi şev û rojan dixebeitin û çendî dikarin zemên bar dîkin.

Roja tiştekî bi ked nekeviyê, bi xwe re ji bo me û li dijî dijimin tiştekî neyîn tune. Kesê hinekî baldar dijî, hinekî çavên wî dibînin û nan ne bi guhêne dixwe, hinekî reş û spî ji hev derdixe û zanê duh êvarê ci xwariye, bi vê rastiyê dihese.

Di nav vê rastiyê de em radibin û rûdinin, zarokê me û cîlênuh mezin dibin, roj li me derdikeve û diçê ava.

Berê, rojen me bi bînî dianîn, em bi hatina wan dihesîyan lê gelekkî kêm bû. Kêmbûn li aliyeckî. Cureyê bîranîna wan ên hebûn jî bêring, bêdeng û gelekkî bi rebenî bûn. iro ne wiha ye.

Rojen di jiyanâ me kurdan de şopên dîrokî çedîkin, gîranî wezneke wan heye, ne çendek, belê bûne bi dehan û pîrozkrîna wan, beşdariya di wan de, firehî û seranseriya vê beşdariyê jî li Kurdistan û di nav gelên cîrân û dûr de deng dide.

12 Nîsana buhuri bi coş û beşdariyeke navneteweyî li Bruselê li Parlamentoya Kurdistanê sêsalîya parlamentoye hate pîrozkrîna.

Deh rojan piştire 22'yê Avrîlê, li bajarê Kolnê li Almanyayê Yekîtiya Rojnamevanê Kurdistanê, sedsaliya rojnamegeriya kurdî, bi şahî û paneleke dîrokî bi bîr anî û xelata rojnamegeriya da Miqdât Bedirxan.

Di deshpêka meha gulanê de, ji bo çarsedsaliya Şerefnamê li Berlinê, ji aliye İnstituya Kurdi jî bo Lîkolîn û Zanîstê, bi derengî û ne di sala xwe de be jî pîrozbañî û şahîyeke serketî hate organîzekirin.

Eli dora du hefteyan e careke din di MED TV de, li ser sê saliya ji dayikbûna Televiyona Medê program têne çekirin û amadehiyê şahîye û mezintir li dar in.

Her şahî û her salveger nîşana guhartinêne mezin, zîndîbûn û balixbûna neteweyî û jiyanêke bihiş û hismendî ye.


Tiştîn heta niha kêmbûn, balixbûn û hismendî bûn. iro ev her du jî hene. Êdî kes heye karibe pişta me deyne erdê? Na. Na û sed carî na.

Nivîskar Naci Kutlay:

# Kurdên xwende xwe dane alî

**P**irsa herî girîng pirsa kurd e. Em bêjin, tu yê meseleya kurdî çawa çareser bikî? Bersiv nayê dayin, cihê ku xeberdan tune be, çareserî wê çawa çêbe? Ji bo vê yekê jî ez dibêjim demokrasiyeke têkûz. Tu dixwazî tiştekî bêji lê tu ditirsî. Îro li Tirkiyeyê partî hene, navê wan bi Cumhuriyet û demokratê dest pê dikin û hew!

Ronakbîr û nivîskarê kurd Naci Kutlay, ji zû ve di nav têkoşîna neteweyî ya kurdan de cih digire. Digel kar û barê siyâsi bi karê ronakbîrî û wêjiyî jî rabûye.



"Li ser  
meseleya  
kurdi ez  
naxwazim  
xeber bidim  
lê kurdên  
xwende  
gelekî  
bêdeng  
mope, lajî vi  
kutî nebûne.  
Ji pirsa  
dawteke xwe  
nogdin der."

**D**îvî mirov nekeve nav kompleksê û li kêmasyîn xwe bigere. Kurd radibin û dibêjin: 'Em kuştin, em wiha kirin û hwd.' Berî her tişfi divê tu xwe deynî holê, li vê derê rewşa te ci ye? İnsan ci kiriye? Mêjiyê wî ji dinyayê re çiqas dest daye. Tirk ji vê yekê re dibêjin "Çağdaşlaşma/nûjenî. Gelo di dîrokê de em çiqas nûjenî bûne?

**W**ekî tê zanîn, hûn jî di sala 1959'an de ji doza 49'an hatibûn girtin. Hûn dikarin qala doza 49'an ji me re bikin?

■ Niha hin kes hene meseleya 49'an gelekî mezin dikin. Rast e. Ez yek ji wan bûm lê divê mirov bejna xwe bizanibe. Em çiqas bûn, ci bû, em ci difikirîn? Weki tê zanîn cihê ku kurd lê dijin, tim zordarî hebûye. Dengê mirovan ji hêla tehsîldaran ve, ji hêla memûr û leşkeran ve hatiye birîn. Hin zarok rabûne çûne cihê wekî Stenbolê û hin ji wan jî çûne bajarê Ewrûpayê. Ew kes zarokên dewlemendan bûn. Di dema me de êdi rewş guherî. Memûran ji zarokên xwe dişandin dibistanê. Kesên din jî çav li wan kirin. Zanîngeh jî wê demê bi tenê li Stenbol û Enqereyê hebûn. Fakulte jî kêm bûn. Ew kurdên ku hatibûn zanîngehan ji dê û bavêن xwe hîn bibûn ku, ci bi şerê wan de hatiye. Mesela ji wan re gotine 'Zimanê we tuneye'ango "Kuyruklu Kürt" (Kurdê bi dûv). Ev insan wisa bêkêf bûne. Ew kesen ku ji van gotinan bi derd û bi keser in, hev dibînin, bi hev re hevaltiyê dikin, bi hev re kilamên kurdi dibêjin, şevan çedîkin. Dema van dikin, di serê wan de pirşen hezar salan çedîbin. Li ser çareseriya rewşa welat û insanên xwe, serê xwe dişinin. Serdest, bi zimanê wan, bi halê wan keniyane. Lewre jî ev zar û ciwanên kurd, ji bo ku rê li ber van yekan bigirin, hatine cem hev û yekîtiya xwe saz kirine.

Lê belê wê demê, Tirkîye ketiye

rewseke nebaş. Partiya Demokrat (DP) ketiye tengasîyê. Bivê nevê mirov wekî berê naflîkirin. Ji dema yekpartiyê bêhtir, insan axivîn û hîn tiş rexne kirin.

Wê demê çavê kurdan jî êdi vebûye. Ciwanên kurdan jî xwe nas kirine. Wê demê rewşa hikûmeta tirk her ku diçû xira dibû. Wisa bûbû ku nedîhiş ciwanîn kurd, bi taybetî xwendekar çavê xwe vekin. Wê demê Mele Mistefâ Barzanî jî çûbû Rusyayê, pişti ku vegerrya li Iraqê iştîlal çêbû. Partiya wî PDK'ê dikaribû legal bixebite, vê yekê tesir li Tirkiyeyê jî dikir. Tirkîye ji vê yekê aciz bû. Wê demê Celal Bayar dixwest, kurdan gelekî bişîne, sîrgûn bike û gelekan ji wan dar ve bike. Adnan Menderes û Fatin Rüştü Zorlu li dijî vê yekê derketin û diyar kirin ku, jîxwe itîbara Tirkiyeyê li derve zêde qels û lawaz e, bi vê yekê wê rewş kambaxtir bibe. Di wê pêvajoyê de em hatin girtin. Ji salekê bêhtir em di zîndanan de man. Piştre iştîlala 27'ê guilanê çêbû, ji bilî me kurdan hemû kes serbest berdan. Pişti sal û nîvekê em derketin dadgehê. Darizandinê 7-8 sal dom kir. 49'an bi dil û can gotine li Tirkiyeyê demokrasî, mafîn kurdan ên insanî û hwd.

Hin xebat ji bo çareseriya pirsa kurdi têne kirin. Ci fêde û xisara van xebatan heye? Ji bo çareseriye pêdivî bi gi heye?

■ Ev pirsa hanê, li Tirkiyeyê û li welatê me pirsa herî girîng e. A niha li Tirkiyeyê demokrasî tune ye. Em bi bê-


## URTEJIYANA NACI KUTLAY:

"Ez di sala 1931'ê de li gundê Tendûrekê bi ser Tuzluca ya Agiriyê ye, ji dayik bûme. Pişti ku min dibistana navîn li Agiriyê û lise jî li Erzeromê kuta kir, di sala 1957'an de ji Fakûlteya Tipê ya Zanîngeha Enqereyê ez mezûn bûm. Di heman fakûlteyê de min, iştisasa cerahiya giştî kir. Ez li bajar û navçeyên cur bi cur û di gelek saziyên tendirustî de xebitîm.

Ez ji 49 rewşenbîrênd kurd im, ku di sala 1957'an de ji "Doza 49'an" hâtibûn darizandin. Di 12'ê adara 1971'ê û 12'ê rezbera 1980'an de ji hêla rêveberiya leşkerî ve hatim girtin. Pişti girtina 12'ê rezberê serbest hatim berdan lê pişti ku kifş bû ku wê dîsa ez bêm girtin, ez derbasî derveyî wejat bûm. Niha li Tirkîyeyê jiyana xwe didomînim."

## BERHEMEN NACI KUTLAY YÊN KU HETA NIHA HATINE WEŞANDIN:

"İttihat-Terakkî ve Kürtler" (İttihat Terakkî û Kurd), "Zeviyen Soro", romana bi kurdî, "Soro'nun Toprakları" wergera tirkî ya romana "Zeviyen Soro", romana Cengiz Aymatov "Evîna Cemîlê" bo kurdî wergerand, romana kurdî "Dê û Damarî" ya nivîskarê kurd Egîdê Xudo, ji tipêni Kîrîlî bo tipêni latîni veguhêst. Her wiha bi navê "Kürt Kimliğinin Oluşum Süreci (Pêvajoya Pêkhatina Nasnava Kurdan)" û "Anılarım (Sêrpêhatiyen Min)" du pirtükîn wî yên dawîn hatin weşandin.



jin, tu yê meseleya kurdî çawa çareser bikî? Bersiv nayê dayin, cihê ku xeberdan tune be, çareseri wê çawa çêbe? Her tişt bi demokrasiye ve girêdahî ye. Ji bo vê yekê jî ez dibêjîm demokrasiye têkûz lê ne demokrasiya ku tu rabi dev û lêvîn xwe boyax bikî. Pirsa kurd fro bûye tabû, qedexe ye. Tu dixwazî li ser vê yekê tiştekî bibêjî lê tu ditîrsî. İro li Tirkîyeyê partî hene, navê wan bi Cumhuriyet û Demokratî dest pê dikin û hew! Mesela em bêjîn Belçîka û Îngîlîstan bi qraltyê têne bi rêvebirin lê em baş dizanîn ku, li van welatan demokrasi heye. Ev yek jî bi tekoşîna 300-400 salî hatiye pê.

Li Tirkîyeyê jî hetanî demokrasî saz nebe, heta gelê tirk û gelê kurd vê rasîtyê nebînin, çareseriya meseleya kurdî jî wê li holê bimîne.

*Ez ne şas bim, di 22'ê rîbendana îsal de, li Stenbolê ji bo çareseriya pirsa kurdî, der barê muxatab dîtinê de, nameyek ji bo çapemeniyê hate xwendin. Hûn dikarin behsa vê meseleyê bikin?*

■ Di vê pirsa te de, meseleya muxatab dîtinê nayê bîra min, tiştekî wisa nîn e. Der hêqê meseleya kurdî de ez naxwazim xeber bidim lê kurdêne xwende gelek bêdeng mane, teví vî karî nebûne. Em bibêjin yênu ku bikarîbin tiştekî binivîsin, çap bikin, fîkrîn xwe bibêjin, nikarin ji tîrsa hikûmetê xwe bidin der. Ev çalakiyeke wisa bû ku, mirov dikare tiştekî bike an nikare bike. Lî organîzékirineke baş nehatibû çêkirin. Nêzîki 60 heval hatibûn, divê ev hejmar zêdetir bûya. Ne bi tenê ji Enqere, Senbol û Amedê, diviyabû ji çar hêlén Welêt, Tirkîye û Ewrûpayê vexwendi hebûna. Kêmasî hebûn lê disa jî baş bû. Divê insan bêne cem hev, bipeyivin, bibêjin gelo mirov dikare ci bike? û hwd. Civîna me ji bi vî awayî bû, em hatin cem hev, cihê ku em civîyan jî eşteke bû.

*Ronakbîrênd kurd ku berhemên xwe bi kurdî binivîsin, wê ne çêtir be?*

■ Belê amîn! Divê piranî bi tirkî be an kurdî be. Tiştekî wisa bê gotin zehmet e. Lî belê divê mirov bi zimanê xwe nivîsandinê bipêş de bibe. Lî divê nivîskar nebêje; "ilehî ez ê bi kurdî an ji bi tirkî binivîsim." Kijan ziman ji mirov re hêsan be, divê mirov bi wî zimanî binivîsine. Mînak hin heval hene bi kurdî nanivîsin, lê dema dixwazin tişten baş derdixin holê. Divê mirov wan kesan teşwîq bike.

Mehmet Uzun 5-6 romanên bi kurdî nivîsine. Kesekî din dikare rabe 2-3 hebîn din binivîsine.

*Li ser nivîsandina rewşa gundiyan, çawa ku we behs kiriye, we li bajareñ Kurdistanê yên wekî Mêrdîn, Amed hwd. doktorî kir, wê demê rewşa gundiyan çawa bû? Heman rewş bi ci awayî di berhemên nivîskaran de xwe dide der?*

■ Niha heger mirov li nivîskarêne Tirkîyeyê binêre, (yên eslê wan tirk, çerkez ango kurd ci dibe bila bibe) nivîskaran demekê halê gundiyan anîne zîmîn. Berê nedihate nivîsandin. Yanî em bêjîn wexta ku Tirkîye ava bû, kesek ji Enqereyê ango ji Stenbolê ranedibû û nedîcû Anatoliyayê. Nedîtibûn ku bikarîbin binivîsin. Hemûyan ewrûpî teqlît dikirin. Dixwestin rewşa salinan, rewşa bajariye, evînê û tişten wîlo binivîsin. Gunditî realîsteyeke geleki girîng bû. Piştre Mahmuf Makal rabû, Yaşar Kemal û Orhan Kemal rabûn û dest bi nivîsandina romanên li ser jiyanâ gundiyan kirin. Wisa bû ku êdî ev cureya nivîsandinê bibe model.

*We di pirtûka xwe ya bi navê "Kürt Kimliğinin Oluşum Süreci (Pêvajoya Pêkhatina Nasnava Kurdan)" de 200 salên dawîn berbiçav kirine. Hûn dikarin bi kurtasî behsa vê pirtükê bikin?*

■ Belê. Wekî hûn jî dizanîn, di 15 salên dawî de, li Tirkîye û cihanê li ser meseleyen azadî û neteweyetiye gelek nîqaş çêdibin. İcar mirov dixwaze di vî warî de li ser kurdan ji hinek tişten ilmî binivîsine. Mesela bi nivîsandinê neteweyâ kurd ci ye? Çawa hatiye holê? Di dîroka wê de ci bûye? Ji ber ku iro din ya li ser gelek tişten mezin bi awayekî hûrbîni disekine.

Ernest Galler, li ser neteweyetiye teoriyên nû derxistîne. Em bibêjin 3000 sal berê dîroka me heye. Gel hene insan li cem hev in, bi hev re dijîn, wê gavê tu neteweyî modern dertînî holê. Bi vî awayî min xwest, ez neteweyetiye kurdan û nasnava kurdan bidim munaqeşekirin. Kurd ji berê ve li van deveran ji yane. Di dema Osmaniyan de rewşa mîrtiyê kurdan ci bûye? Rêzbûn û rewşa civata wan ci bûye? Di nav osmaniyan de pişti şerî yekemîn, di dema şerî duyemîn de û di dema Cumhuriyete de gelek bûyer pêk hatine. Mirov dixwaze bizane ka di wan deman de kurd di ci rewşê de bûn. Di 10 salên dawî de hem li Ewrûpayê û hem jî li Tirkîyeyê gelek tişt qewimîne. Gelek ji wan hatine nivîsandin.

Neteweyî kurdan ji neteweyîa tîrkan tesîr girtiye. Ji bo vê yekê min xwest ez van bînim holê. Em bêjîn vê dawîye de, tirkîn modern kurdîn modern di vî warî de ci dibêjîn, min xwest wê bînim holê. Mesela li ser Ehmedê Xanî, insanê me hemûyan gelek tişt gotine. Niha em bibêjin Ehmedê Xanî 300 sal berê ev tişt nivîsiye, tu dînihîri ev neteweyî modern tune bûne. Wî nivîsiye lê divê ev yek di ber çavan re bén derbaskirin.

Sosyologê holandî Martin Von Brünenessen li ser yekê gelek tişt gotine. Min ev tişt nivîsi, min xwest bêne lêkolîn. Vêca ez niha li benda insanê xwe me ku lêkolîn nû derxin holê. Vêca mirov van bîne berhev, vî karî pêş de bibe. Çawa min li jorê got, ez dixwazim hinekî li ser civata xwe bisekînim û

li ser vê bingehê kar, hewldan û lêkolîn xwe bidomînim.

*Niha li ber destê we xebatê bi ci rengî hene?*

■ Vê gavê ez dixwazim, li mijaren ku bo kurdan pêwîst in bikolim. Dibe ku ev mijar ji bo gelên din jî pêwîst û girîng bin. Divê mirov bi analîzen fireh û qenc li pisgirêkîn insanê ku li Tirkîyeyê dijîn, mîze bike û nîqaşan bide destpêkirin. Dixwazim li ser vê bingehê xebatê xwe yên ji iro û şûn de pêk bînim. İnsanê me ji dûr ve li gelek tiştan dinêrin, ji kûrahî û firehiyê hez naakin. Girîng e ku em pariyekî li vê yekê hûrbîbin. İnsanê me, rexne li xwe nagirin. Divê em xwe deynin navê û li ser xwe bisekînin. Ez dixwazim ku kurd li ser riya ku tê de ne, riya ku tê de derbas bûne û rewşa wan ên dawî ci ye, hinekî rexne arasteyî xwe bikin. Lewma ez li ser vê yekê xebatê dikim.

*We got rexne. Gelo em dikarin pêş-neveçûna gelê kurd, bi kêm'bûn û qels'bûna rexnenegirtine ve girêbidin?*

■ Rast e. Ev yek ne bi tenê ji bo me, her wiha ji bo tevahiya gelan wisa ye. Mirov neheq be jî mafdar be jî divê leqayî rexneyan bê. Ci erêni û ci jî neyîni. Pêşveçûn wisa pêk tê. Vêca ez nikarim bibêjîm, kurd bi tenê ji bo vê yekê li paş mane. Ev rewş psikolojîk e: Divê mirov nekeve nav kompleksê. Divê mirov li kêmasyîn xwe bigere. Lî heger kêmâsi û pirsgirê di te de hebin û tu ji bo çaraseriya vân kêmasyan xwe nexî navê û li xwe negerî, tu nikarî bersivêvan pirsan jî bibînî. Wekî mînak kurd radibin û dibêjîn: 'Em kuştin, em wiha kirin û hwd.' Berî her tişti divê tu xwe deynî holê, li vê derê rewşa te ci ye? İnsan ci kiriye? Mêjiyê wî ji dinyayê re çiqas dest daye. Tirk ji vê yekê re dibêjîn "Çağdaşlaşma/nûjenî. Gelo di dîrokê de em çiqas hevdemî bûne?"

Hevpeyvin: AZAD JIYAN

*Bi qîz û law bi bav û kal:*

# TİMMİ!...

## TİMMİ

Zarêñ pêçek û çelî  
Bi xwîn û bi silî  
Bi deh bêçî û deh tilî  
Tilîlî bikin tilîlî

Gazî bikin bira û xwenga  
Gav bikutin mîna singa  
Bi didan û bi nînoga  
Tilîlî bikin tilîlî

Bixemîlin bi sê renga  
Wek teyr û tû wek pilinga  
Bi hing û hing û ringa  
Tilîlî bikin tilîlî

Roj hilat li ser niştiman  
Kesk û sor û zer bû ezman  
Rabû ser çar lingan ziman  
Tilîlî bikin tilîlî

Al bi xwîna sor xemili  
Azadî hat çû zelûlî  
Bi kurmancî û dimili  
Tilîlî bikin tilîlî

Ji bo welat xwîna rijiya  
Mîrî ji gornê vejiya  
Azadî wekî rojî xuya  
Tilîlî bikin tilîlî

Erd û ezman her kes zane  
Kurdistan êdî bêjan e  
Zarokên me bê xwedî mane  
Tilîlî bikin tilîlî

Bi qîz û law bi bav û kal  
Bi derpê bi kiras û şal  
Bi kofî û keftî egal  
Tilîlî bikin tilîlî

Law xort û şervanên jêhat  
Serxwebûn bi destê we hat  
Ji bo aramiya welat  
Tilîlî bikin tilîlî

Bi çav û biriyen Egîd  
Me qırqurşûna yekem dît  
Bi sê desmal û bi sê çit  
Tilîlî bikin tilîlî  
Ji bo Beseya şîrhalal  
Ji bo Zekiyeyâ delal  
Ji bo Hakî û Kemal  
Tilîlî bikin tilîlî

Wargehêñ kurd heps û zilm e  
Mîrin li ser bêhn û hilm e  
Ev govend ji bo Mazlûm e  
Tilîlî bikin tilîlî  
Gelên şoreşger bihîzin  
Ji bo Ibo, Mahir, Deniz  
Ji bo Serokê herî mezin  
Tilîlî bikin tilîlî

İlhamî Özer

## DELİL

Ji navek ne nav  
Navek hezar nav.  
Li ser ziman  
Her gav û her gav

Mêrxas çeleng  
Pêşengê leheng  
Gernasiyê de  
Tu bûye mîheng

Firek li Gabar  
Li Bagok, Hesar.  
Firek li Cûdî  
Payîz û bîhar.

Riya te pîroz

Domand rojekê  
Dengê qîra te  
Diçû Dihokê

"De lêxin lêxin  
Gerîla lêxin:  
Pêtala felat  
Hûn iro pêxin."

Fena teyrê baz  
Seyd kir li hevraz  
Dagirkê Rom  
Bûbû belengaz

Delîlê mezîn  
Hilda tola min  
Kiribû dojeh  
Ew roj li dijmin

Şevek havînê



Rizgarî her doz  
Gerîlayê jîr  
Hevalê dilsoz

Pêşî tu û şeş  
Bi rext û keleş  
Tu dilşa razê  
Ref bûye Artêş

Kawayê hemdem  
Çekdarê yekem  
Tu bî kiryarê  
Fîseka duwem

Tirsek pir giran  
Te xist nava wan  
Dema hilgirt çek  
Derkete çiyan

Rojek bîharê  
Meha adarê  
Li wî pesarı  
Li wê berwarê

Şerê Bagokê

Hîn tu li jînê  
Xweş tê bîra min  
Cerda Mêrdînê

Cehd û berxwedan  
Ket sala pêncan  
Çarê pûşperê  
Tu bû pakrewan

Finda te pê ket  
Al bi bircê ket.  
Îcar dilşa be  
Şoreş bi rê ket

Bro Omerî

## EY NETEWA

Ey netewa bindesto pir bar giran  
Werin bigirin destêñ hev wekî biran  
Herkes diçe hîvê stêrê û deran  
Em mane bindest, reben û talan

Cîhanê de carek tev rabin ser xwe  
Bi zanistî bikin karûbarêñ xwe

Bidin hevdu dest, pişt, dil û can  
Dijminan zorê derxin ji warê xwe

Wekî moriyan bikin xebat û lebat  
Hemberî dijminan bibin hêz û lat  
Tevger enî, taqtik û peşveçûn  
Ku rizgar kin ji destê dijmin welat

Ku neki teqtik, enî û yek destûr  
Bindesto dijmin de bibin tar û hûr  
Her kes were li ser te bidê dar  
Nema tu netew i nema biki kar

Tu maye şerpeze, bindest û reben  
Ne hêz heye ne mal heye ne düzen  
Rabe ser xwe di cihan de bibe deng  
Bi têkoşîn yan tunebûn yan hebûn,

Ey feqîrno hûn risteke xwe çêkin  
Ala rengîn bi ser xwe de li ba kin  
Di cihan de em jî hene yek netew  
Fûze, fîrok û komara xwe peyda kin

Feqîr Ahmedî

## Nêçîrvan

Tev de rext û çek  
Tilî tetik  
Çav nîgeh  
Bêhngirtî,

Nişke ve kuştin  
Xezala narîn  
Kewê gozel...

Nêçîrvano!  
Ne bes e  
Domandina vî karî  
Nebêjê  
Tu kî yi  
Ez  
Xak im xak  
Li ber daf û tivinga te!

Edî ne bêkes im  
Ked im  
Keda jêhatî û lêhatî  
Keda keça Zilan  
Tîrêjîn rojê  
Ronahî û Bêrivan.

Nêçîrvano!  
Nebêje  
Tu kî yi  
Ez  
Agir im agir  
Hîv û sorahî  
Li bedena kelehan  
Zekiya û Rahşan  
Hevdem asoyêñ nûjen,  
Çawa bê parastin  
Awir û bizavêñ we  
Di gulistana min de!

A. Karabağ

NÇM'ya Stenboîê

## ● 23 gulan 1998 şemf:

Konser, Vengê Sodîrî, saet:14:00

Kovara Jiyana Rewşen "Şevêne Toreyî" ku mehê carekê tê lidarxistin, didomîne, saet:18:00

## ● 24 gulan 1998 yekşem:

Konsera Hozan Mustafa,saet:14:30

Konsera Agirê Jîyan, saet:18:00

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



## ● 29 gulan 1998 in: Film: Nemir 'Z' (Ölümstûr 'Z')

Derhêner: Costa Gavras, saet:18:00

NÇM'ya ïzmîrê

## ● 23 gulan 1998 şemf:

Konsera Hozan Xanemîr, saet:18:00

## ● 24 gulan 1998 yekşem:

Konsera Hozan Xanemîr

Seansa Yekem:15:00

Seansa Duwem:18:00

## Serkeftina zarokê kurd



**L**i Almanyayê li bajarê Giessenê ku bi ser Eyaleta Hessenê ve ye, bi piştgiriya UNICEF, Wezareta Karên Derveyî ya Almanyayê û ji layê Weqfa Tendirustiyê ya Alman û Tirkan ve pêşbaziyeke wêneyan bo zarokan hate lidarxistin.

Di vê pêşbaziya ku di nav meha adarê de saz bûyi de, bi navê Ümrân Özalp zarokekî kurd xelata derecaya sêyemîn wergirt. Piştî wê yekê li ser daxwaza Wezîrê Karên Derveyî yê Almanyayê Klaus Kinkel, zarokên xelat-gir li Bonnê di roja 27 adarê de diyariyên (xelat) xwe ji destê Kinkel wergirtin.

Ümrân Özalp di sala 1987'an de li navçeya îdilê bi ser Şirnexê ve ji dayik bûye. Ev sê sal in ku ew li Almanyayê dijî. Her wiha ew di dibistana seretayî ya bi navê Grudschiule de, di pola sêyemîn de dixwîne. Hem xelat wergirtina Ümrân Özalp û hem jî daweta Wezîrê Karên Derveyî yê Almanyayê Klaus Kinkel, ji

aliyê malbata Özalp û derdorê kurd ve bi dîlxweşî hate pêşwazîkirin.

Li ser vê yekê em bi mamosteyî Ümrân Özalp Salman Uungan û bavê wî re axivîn. Bi pey agahiyêng Uungan, Ümrân digel bêdengî û şermokiya xwe ji bo pêşerojê hêviyê dide mirrov. Bavê Ümrân Özalp jî diyar kir ku, kurd di ser de çawa têdikoşin û bi ser dikevin, êdî ji vir û pê de wê di warê hunerê de jî serketî bin. Wî daxuyand ku, ji bo ku zarokê wan layiqî gelê xwe bibe, ji bo pêşketina wî ci ji wan bê, ew dê bikin.

Her wiha wênesazê biçük yê kurd Ümrân Özalp jî di vê derbarê de diyar kir ku ew dê ji vir û pê de jî sazkirina wêneyan bidomîne. Özalp wiha axivî: "Gava ez mezin bûm, ez bidim xwe ku ez welatê xwe û têkoşîna gelê kurd di wêneyê xwe de baştir pêşkeş bikim."

A. WELAT / GIESEN

## NÇM PÊŞBAZIYA ÇIROKAN'98

Pêşbaziya Çirokan a ku yekemîn car par ji hêla Beşa Sînemayê ya NÇM'ê ve hat lidarxistin, îsal dîsa tê lidarxistin. Çirok dê ji bo pêşnûmayêñ filman ji bêñ nirkandin. Pêşbazi dê bi kurdi û tirkî, pêk bê. Serlêdan dê bi riya postayê an jî bi dest li NÇM Beşa Sînemayê bêñ kiran. Dema serlêdanê ya dawîn: 15 Tîrmeh 1998.

## MERCÊN BEŞDARIYÊ

\*Nivîskar di hilbijartina babeten de serbest in.

\*Beşdar dikare bi tenê di warekî de, bi çirokekê beşdarî pêşbaziyê bibe.

\*Çirok divê bi kompîtûrê an jî bi daktifloyê bêñ nivîsandin û pêwîst e ku ji 10 râpelên A4 neborô.

\*Çirokên ku têñ şandin divê berê di tu derê de nehatibin weşandin.

\*Çirok dê 5 kopî (hejmara juryê) bêñ şandin.

\*Wê li ser çirokê bi tenê remz (navekî lêkîrî) bî nivîsandin. Li tenîşa wê, li ser zerfeke girtî wê heman remz bê nivîsandin û li hundîrê wê jî dê navê rastîn, navnîşan, jimara telefonê û jînenîgarî lê bê zêdekirin.

\*Çirokên ku li van mercan neguncin dê neyên nirkandin.

## JURİ


## Tirkî

Ahmet Soner (Senarîst)  
Semir Aslanyürek (Mamosteyê Sînemayê)  
İşik Kutlu (Nivîskar)  
Hasan Kiyafet (Nivîskar)  
Kazım Öz (NÇM-Beşa Sînemayê)

## Kurdî

Helim Yûsiv (Çiroknûs)  
Firat Cewerî (Kovara Nûdem)  
Hasan Kaya (Înstituya Kurdi)  
Sami Tan (Azadiya Welat)  
A. Rahman Çelik (Jiyana Rewşen)

## TİSK



## Miyana şaran de pirdan eştene

LERZAN JANDÎL

**S**ebetake lecî/cengî benê û bado vêrenê ra, lecan ra dime aştiye virazîna, lecan de ciyo muhîmîr o wo, ke ganî mordem miyanê/wertê şaran de pirdan merzêro, merijno.

Ewro jî miyanê dewleta tirkan û azadîwaştoxanê kurdan de lec esto. No lec hetê dewletê ra bêqural êno kerden û lecêde qilêrin o.

Aşma çarîne ra nat dewlete dest bi Operasyonê Muradî kerd. Dewlete hetê ra vana "qediyayî" "kok re ci amê", hetê ra jî oparesyonanê gîrsîriyan virazena. Béguman no operasyon teyna operasyonê de leşkeriyê niyo. Dewleat xoriye ebi nê lecî hetêra wazena, kurdan ebi leşkeriyê bidêro vindarnayene, hetê ra jî wazena, pirdanê miyanê şarê tirkî û kurdi de birijino.

Seba nê armancî jî dest ra ci êno, ê kena. Her ci ra ver dewletê dest bi lecê psîkolojîkî kerd. Medyaya tirkan nimûneyê de zaf xirab musnena şaran de medyaya dinyaye. Béguman mantiqî lecanê qilêrinan de mordem şikîno naye, her çığa ke duşte etîkî mordematiyê û lecî de ra jî, fam bikero. La belê ganî nêro xo virî kerdene; Eke leco psîkolojîk ebi nê pêlanê şovenîstiye, ebi na dişmentiye duşte şarê kurdi de dewam bikero. La belê ganî nêro xo virî kerdene; eke leco psîkolojîk ebi nê pêlanê şovenîstiye, ebi na dişmentiye duşte şarê kurdi de dewam bikero, şarê kurdi ra bêro xebêrdayene, leşa merdanê xortanê kurdan mezelan ra bêro vetene, bawar bikerê, pirdê miyanê şarê kurdi û tirkî êno rîjîyene. Feydê naye nê tirkan rê ne jî kurdan rê esto. Her hal de kedkar, amegdar û dewijê hûrdmin şaran zametiye ancenê.

Wunciya dewlete heto bîn ra ebi kîştena xortanê kurdan, Kenan Mak û Bilal Vuralî faşîstê "sivil" kerdi devre. Protestoyê Mayenê Şemî û protestoyê bînî kerdi qedexe. Ebi naye wazena, faşîstî wunciya zê seranê 80 yîne aktif bê û karo ke dewlete eşkera nêşîkîna bikero, wa faşîstî zê vero coyî bikerê. Na jî dewlete rê bes nêbiye. Nafa jî waşt, ke roja 12.05.1998'de Akin Birdal bidêro kîştenê.

Akin Birdal parezkerê mafanê însanî yo. Zaf rayan û cayan de bê ciyatiyê duşte îhlalkerde û mafanê însanî veciyo, seba naye lec kerdo, amo pêguretene. Her ci ra ver jî duşte lecî qilêrinî de veciyo, seba mafanê şarê kurdi kerdo. Nivîskaranê şovenîstan cira xebêr do. La belê o nêterso, karê xo avêr berdo.

Sebebê ebi armancê kîştenê bîrîndarkerdena A. Bîrdalî béguman pozisyonê dê wo ke duşte lecî qilêrinî de veciyan a. Dewlet ebi gamê de bîne wazena, ke meselay kurdan rîyna bikero bîn wele. Seba naye jî kam engelo ganî werte ra bêro "wedardayene". Serê nê kesan de jî Akin bîrdal amêne.

Naye ra dime, eke muhalefetêde girs mero viraştene, dore êna, roşnavîr û rojnamevananê tirkanê, yê ke hetê kurdan de cayê xo genê û welatparêzê kurdan. Na werte ra wedardena ke bi kîştena Vedat Aydinî dest kerdi ci û hetanî niya teyna welatê me de biyêne, nika jî metropalanê Tîrkiye de bena. Armancê nê kîştenan, tersnayen û bêvengkerdena muhalefetî ya. Eke muxalefet nêtersa, xo organezî kerdi û ebi vengêde berz waştenê xo vaşî, dewletê nêşîkîna bireso armancê xo.

Seba naye jî bêveng mevendîme! Yew bîme û vengê xo berz kerime!

**H**evalên heja, berî her tiştî ez silav û rêzên xwe li we dikim û ez tim xweşiya we dixwazim.

Vêga ez dixwazim xwe bi we bideme na-sîn. Navê min Adem e. Ez çarde salî me. Bi gotina tirkî ez diçime îlkokulê, sala 5'an. Dersê min zaf baş in şikir ji Xwedê re.

Dema ku we dest bi rûpela Yarîgeha Zarokan kir bi teşwîqa birayê xwe min jî xwest ez ji hinek berhemên xwe tevlî bikim. Bi arika-riya birayê xwe, min resmek (wêne) xêz kir. Ez hêvidar im ku hûn hêjayî weşandinê bibînin vê resimê di rojnameyê de biweşînin. We gotibû hûn dikarin wêneyê xwe jî bişeyînin, pa ku ew jî bi weşandin. Min jî wêneyekî xwe şand.

Vê rûpela xwe, em zaf kêfxweşî dixwînin. Ji boy ku we ev rûpel ji me re vegetandiye ez zaf teşekur (spas) dikim. Dawî ez dixwazim ji hevalên xwe yê kurd re mesajekê bidim.

Hevalno! Hûn hemû ji dizanin ku fro ji her aliye ve serê me di belayê de ye. Ji ber ku em bibine xwedî heq û bigihîne azadiya xwe di-vê em zaf bixwînin. Ez jî ji we re dibêjim, zaf bixwînin. Dijminê me çiqasî dişixule divê hûn di cara li wan bişixulin û bixwinîn. We-kî din azadiya we ne mimkûn e.

ADEM BAZ



Amedekar : ADEM BAZ

## Helbest Tîştonek

### Bi kurdî dixwînim

Dixwînim, dixwînim  
Bi kurdî dixwînim  
Pirtûkan dixwînim  
Çê neçê dibînim  
Roja çûm dibistan  
Bûme xwedî raman  
Bi xêra dê û bavan  
Mala wan tim ava  
Wan rê şanî min da  
Serê min pê hildan  
Ez jî didim sozê  
Xurt herim vê dozê  
Bixwînim bixwînim  
Bi kurdî bixwînim  
Navê kal û bavan  
Hildim li rojava  
Bixwînim bixwînim  
Bi kurdî bixwînim  
Ava bikim welat  
Bibim gor û xelat  
Hêviya welat bim  
Pêşmergê felat bim  
Dixwînim dixwînim  
Bi kurdî dixwînim.

\*Ev helbest ji pirtûka KONÊ REŞ a "Şagirtê Bedir-Xan im" hatiye wergirtin.

## Mamik

Lem lem dide	û du ling
Gol kef dide	ev ci ne? (Mar, Kew, Masî)
Mar derket	*
masî dev de (Lembe, fitil û Alava serî)	Helm û melmû
*	Min kişand
Taska cim cimî	Şûn reş bû (Kilê çawa)
Tijî erdê genimî (Gûz)	*
*	Oda şûştî
Şkevta bêderî (Dev)	Bilbil tê de rûniştî (Dev û ziman)
*	*
Kûmê Xezalê	Ji jehrê taltir e
xwe berda newalê (Xilorig, Zipik)	Ji hinguv şerîntir e
*	Ji hêştir bilintir e
Şaş tê, maş tê	Ji kuncî ye piçuktir e
Dema bêhn dikî	Ev ci ye? (Dara hêjirê û fêkiyê wê)
Li te xweş tê (Gul)	*
*	Bi roj keleb e
Mam gê min o	Bi şev belav e (Livin û doşek)
Sê giyan	
Şeş cav	

Berhevkar: BERKEN BEREH

## Çivanok

Sê car li ser hev bibêjin.

\*\*\*

- \*Kurm qurm kul kir
- \*Heft hirç pişta her heft hirçan bi pirç.
- \*Şêsek jêr de tê,
- Tacek li serî ye

Min got; Tacê tu ci tacî

\*Sê tişt hene.

Yek gû, yek mû, yek tû.

Bi lingan ketim gû, bi destan ketim mû, bi devan ketim tû.

\*Kera boz li rîzdê zirya.

Ez Yaşin im  
Ser mesin im

Ez hatime  
Te bixesînim

\*

Ez Dewrêş im  
Qelûnkêş im  
Ez hatime  
Te biqelêşim

\*

Hop hopê  
Qere topê  
Ba didim  
Biz didim  
Ser te re didim.

\*

Hanika manika  
Devse devê kanika  
Rê nadî heywanika

\*

Cide cide cide  
Li mala Xalê Hecî li nel mal bû  
Pira jina wî li mal bû  
Kevir û kuçik belav bû.

\*

Lo lo lo Mehmedo  
Terya kerê bermedo  
Heta heqê teb te bido.

# Ji Weşanê Nûbiharê destepirtûkek

Balkê e, kurd û tirk dema behsa zimanê biyanî dîkin, erebî, farsi aango zimanê gelên rojhilatî di nava van zimanâ de nahesibînin. Ev psikoloji şayanî lêkolandinê ye. Lewre digel ku di nav gelên rojhilatî de hevdili û hevçandiyek heye jî, van gelan zêde hay ji hev nîn e. Li Bakur û Tirkîyeyê gelek xwendevan, jiyanâ nivîskar û zanayê rojavayî bi hûrbîni dizanin lê navê nivîskareke/rojhilatî nizanin. Bo nimûne herkes Karl Marks geleki baş nas dike lê na-vê yek ji hîmdarê Marksizmî Ibn-i Haldûn nebihîstine.

Her çendî di vê yekê de rola têr negihîstina teorî û wêjeya nûjen ya rojhilatî hebe jî lê di bingeha vê lînêrin de, wekî ku Fikret Başkaya tîne zimên "Avrupa Merkezî Yabancılaşma (Jixwerekîya-nîbûna ji ber Ewrûpaperestiyê)" pêk tê. Gelên rojhilatî bi erzanî li hev dînihîrin. Vê helwestê rî li ber danûstandina wêjeyî û hunerî jî girtiye. Tişte balkêşirîn, ev helwest ji ber lihevşibîna gelên rojhî-

latî ye.

Gerînendeyê Giştî yê kovara Nûbiharê Sabah Kara bo danasına pirtûka bi navê "Çağdaş İran Şiiri Antolojisi/ Berhevoka Nûjen ya Helbestvanê İranê" kêm

Umran Salahî helbest cih digirin. Ev helbestvan tev di nav ekola berî ihtilala islamî de ne. Her çiqas helbest bi şewaza nûjen hatine ristin ji karîgeriya hêmayen (imge) kevnare yên wekî gul, bîhar, firmesk, agir... hwd di helbestan de diyar in.

Dîsa Sabah Kara rûbâyiên Omer Xeyyam bi navê "Rûbâyet" ba kurdî wergerandine. Di vê pirtûkê de helbestan reseñ yê Xeyyam jî bi tîpêr erekî hatine weşandin. Her wiha Kara, li ser Dubeytîn Baba Tahîrê Uryan xebateke hêja pêk anîye. Wî, dubeytîn Baba Tahîr ji zaravaya lorî li kurmancî anîne. Her wiha di vê pirtûkê de jî helbestan reseñ yê Baba Tahîr bi tîpêr erekî hatine weşandin. Helbestan ku di van pirtûkan de cih girtine, berê di

dawî de cih digirin, pêşin bi tirkî hatine nivîsin peyre bo kurdî hatine wergerandin. Lî kurdîya wan şkestî ye û tesîra fi-kirîna tirkî lê bûye. Her wiha di helbestan Kara de hêmanê didaktîk xwe bêhtir didin der û helbest ji layê hêmayan ve jî zêde ne dewlemend in.

Di pirtûka Çarîn de tişte ku balê dikisîne, tabîrîn amiyane aango argotîk in. Bo nimûne Kara helwesta İslamiyîn neteweyen din ya li hemberî kurdan wisa rexne dike: "Qaso hem misilman e hem segê zaliman e/Hemû tişti dizane lê bi kurdan nizane.". Dîsa nivîskarî İslâmî rewşa Tirkîyeyê jî wiha tîne zimên: "Ker bûne reyiscumhur, dehşik serok-wezîr/Kuro welleh û billeh ne demokrasî ye/Eslî vê dezgeha we, daf û dizokrasî ye"

MAZLUM DOĞAN

## Nûbihar Derket

Hejmara kovara mehane Nûbiharê ya 61. ku li ser sedsaliya rojnamegeriya kurdî ye, derket. Di vê hejmara ku ji aliye dîtbarî ve hatiye nûjandin de, li ser rewş, rabirdû û problemen rojnamegeriya kurdî Ali Karadeniz, Süleyman Çevik, Sami Tan, A. Zeki Okçuoğlu, Fehim Işık, Fırat Cewerî, Murad Ciwan, Hêlim Yûsiv û Lokman Polat gotarek nivîsine. Her wiha hin nivîsen ku ji hin kovar û rojnameyên kevnîn ku ji kurdî hatine wergirtin jî, di vê hejmarê de derçûyine.



û zêde heman tişdiyar kirine. Kara, bi mebesta danasına wêjeya rojhilatî, ji gelek helbestvanê İranî bo tirkî helbest wergerandine. Di vê pirtûka ku ji weşanê Nûbiharê derçûye de ji Nîma Yusic, Ahmed Şamlu, Furux Ferruhzad, Nadîr Nadîrpur heya

Nûbiharê de derçübûn.

Li layê din bi navê "Çarîn", "Mersîyeyen Rojhilatê/kurdî-tirkî", "Nameyên Bêcewab/kurdî-tirkî" sê pirtûkên helbestan ên Sabah Kara ji weşanê Nûbiharê derçûne. Helbestan ku di pirtûkên

kostüm bû. Ew tebance bû. Ma nivîskarê rûsî Çehov jî negotibû; "Heke di sahneye şanoyê de tebanceyek bi diwêr ve daliqandî hebe, heta dawîya lîstîkî mutleq divê ku ew tebance biteqe. Naxwe hewcedarî tune ku tebance bi diwêr ve daleqandî be."

Her çiqas bireveberen şerî taybet ji rusân zedetir Amerikayê û Pentangonê wekî qible ji xwe re dibîn jî, dixuye ku di nivîsandina vê senaryoyê de dane pey şopa-rusiyen. Lewma jî gotine, ji ber ku Akın Birdal di vê senaryoyê de wekî tebanceyek cih girtiye, divê tebance were şkînandin.

Di senaryoyê de her tişte ekere û li ber çavên her kesî diqewime. Hewce nîn e ku bûyer bêne xefkirin. Lewma jî Akın Birdal ro bi nîvro bû hedefa berikan. Kesênu romana Gabriel Marguez a bi navê 'Dusemba Sor' xwendibin, dema ku vê nivîsê bixwînin, dê têkîlîriyekê di navbera van herdu bûyeran de saz bikin.

Piştî birîndarbûna Akın Birdal, xiroşî û şerîjîyek bi rayedar û birêveberen dewletê re çêbû. Li hev rûniştin. Yekî ji wan got, pepû, yê din got, kê kuşt. Çend heban got, me kuşt. Li nav çavên hevûdu nêrin. Yekî ji

wan birûyên xwe bi jor de hildan, di wateya "na" de. Hemûyan bi hev re gotin, me lê nexist. Jixwe çend roj berê jî Mesut Yılmaz gotibû: "İfadeyên Şemdin Sakîk derew derketin. Olof Palme ne bi destê PKK'ê hatiye kuştin. Akın Birdal jî ne tebanceya PKK'ê ye." Wekî ku bêje, Xelkino! Baş guhê xwe bidine ser min, dawî nebîjin te negotibû, heke tiştek were şerî Akın Birdal, bila tu kes neke stuyê me.

Herkes ji bûyeren wiha re, ji senaryoyen wiha ecemî-re: "Tu dibêjî qey filmê tirkî ye." Senaryoya wisa didome. Bi vê suîqastê gelê kurd bêhtir têgihişt ku kevneşopiya dewelata tirk guhê xwe nade tu rêz û prensîben mirovahiyê. Çawa ku gel gotiye:

"Bi gur re dixwe, bi şivan re şîn dike."

Bi tenê mirov dikare çend pîrsan ji evindarê xwîn û xezebê bike: Gelo berikêne we, fişekîn we, dikarin cawê şînspî yê ku li bedena azadixwazan pêçayıye qul bikin. Gelo hûn dikarin hikumdarya xwe li ser rûmet û xîretê bikin? Xweli ser no! Hemû giyandar, lawir, dar, mirov, av, hewâ, ewr û sirûş bi halê we dikene.

**"Bi gur re dixwe, bi şivan re şîn dike."**


HASAN KAYA



Senaryoya filmekî tîrkan li ber çavên hemû cîhanê hate honandin. Pêş, bi zirt û pirtan, bi hile û pîleyan gotin: 'Me mîraniyeke mezin kir, mîna pîlewanan me Şemdin û birayê wi derdest kir.' Her çiqas mirovîn ku piçek mîjî de serê wê/wî de hebe, ji vê derewa dûvdirêj bawer nekirin jî, bazîrganê xwînê, destpêka senaryoya filmê xwe nivîsin.

Gava duymenî manşetên rojnameyên Sabah û Hürriyetê bûn. Sibehekê em ji xew rabûn, me çav li armanca senaryoya filmê tirk ê klasik kir. Di vê senaryoyê de hemû sazî û dezgehîn demokratîk û pêşverû û gelek kesen demokrat ên ku dijberiyê jîşerê gemarî re dîkin, bûbûne kîlik ji çeteyan re. Di nav yên ku wekî kîlikê hatibûn çikandin de, Birêz Akın Birdal jî hebû. Di xemîlandina senaryoyê de Akın Birdal wekî tebanceyekê hatibû nişandan. Rola wî ya di lîstîkê de

# Cotkar û Axa



**G**o axeyek û xulamê wî, ji xwe re derketibûne ret û nêçîrê. Dema ku vege riyan e gundê xwe bi rê de leqayî cotkarekî bûne. Ji xwe re cot dikiriyê. Gotine, qewet be. Cotkar gotiye; Êrê!

Axê got:

- Çima te virnî çand?
- Welel min helî çand lê virnî çêbû (şîn bû).
- Tu bi siya diçê an bi diwa?
- Welel ez bi siya diçim.
- Tu dûr tajî we an nêzîk?
- Welel, heme li ber xwe.
- Dîwan e?

- Tek tek.

Piştî vê xeberdanê, axa û xulamê wî, xatir ji cotkar xwestin û bi ser riya xwe de dom kirin. Piştî ku bi qederekê ji cotkar dûr ketin, xulam ji axê re got:

- Axayê min, xeberdanâ ku te cotkar bi hev re kir, abêje.
- Welel ez nabêjime te. Here bila ew bibêje!
- Xulamê axê carek din vege riya cem cotkar û jê re got:
- Apo, ka wan xeberen ku te û axayê min bi hev re kirin, ji min re jî bibêje.
- Welel an tu yê du zêran bidî min an jî ez ji te re

nabêjim.

- Bila bila. Ez ê du zêran bidime te.

Cotkar got:

- Wexta ku axayê te ji min pirsi got; "Çima te virnî çand?" Yanî got, çima tu dereng zewicî. Min got, welel min helî çand, lê virnî şîn bû. Yanî ez di wextê de zewicîm, lê zarokê min zû çênebûn. Wexta got: "Tu bi siya diçê an bi duwa?" Yanî got, tu darik/gopal didî ber xwe an na? Min jî got, 'Bi siya'. Yanî tevlî gopal bi rî ve diçim. Wexta got: "Tu dûr tajî we an nêzîk". Min jî got, welel heme li ber xwe. Yanî heme ez li ber xwe tenê dibînim. Wexta got: Dîwan e, got diranê te çawan e? Min jî got: Tek tek. Yanî diranê min liblib in. Ha xeberdانا me ev bû.

- Welel ev xeberdانا te, ne bi du zêran, bi sê zêran jî hêjayî ye.

Xulam, sê zêr dane cotkar û dîsa xatir jê xwesû da ser riya xwe.

H. İZARİ

## Zikêşî

Mamoste ji şagirtên xwe dipirse:

- Zarokno! Hûn heşt kes in. Ku ez cil heb sêv, sî û çar hirmî, şest û du heb giwîz û heştê û şes heb xox, li we par bikim, dê her serê yekî/e çend heb bîke? Ji nav şagirtan yek hilpeke:

- Mamosteyê min! Wê her serê yekî/e ji me zikêşiyek li para me bikeve!

## BI XELAT...

	B	L	P	D	K	O	W
N	E	F	I	K	R	I	N
D	R	A	Z	A	R	S	E
H	I	D	T	S	A	L	Z
A	S	O	T	T	R	A	L
R	U	Z	G	G	2	O	R
O	L	E	Z	C	P		
J	L	I	R	A	A		
K	O	R	E	A	N		
T	O	A	B	O	R		

PEYVA VEŞARI → P I S T G I R T

### Bersiva Xaçepirsa 119'an

Xaçepirsa me bi xelat e.

Di 15 rojan de ci bersiv bigilihîjin destê me, emê wan binrixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin.

Xelata hejmara me ya 121'an kaseta Kazo a bi navê "Gola Wanê" ye Jêrenot:


Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşari" di nava quityîn li bin xaçepirse de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînîn.

Pênc kesen xeleta hejmara 119'an pirtûka Nejdet Buldan a bi navê 'Yasaklı Topraklar' qezencikirine ev in: Salih Dağtekin/Riha, Bêrîvan Altımişik/Êlih, Arif Oktay/Tarsus, Rêzan Kaya/Amed, Mustafa Baran/Kayserî

## XACEPIRSA BI XELAT (121)

Iraq, regez Şoresgere ki tirk (wêne)	Paytexta Misirê Bi taybeti	Dawera aktinymû Dengdarê 'nîr'	Bi kirdki heval Qırn, sed- sal	Alavek bo pivandana dexlê Tipêk	Beşike Kurdistanê
Zehir Malbatekê koma ziman	2	Bêdengên 'Sebî'			Baneşane k Gorepan, meydan
Şekil, teşe Dawera hidrojenê		Meyek Kinçek			Tipa berî 'S' yê Cinavkek şanidanê
Vekiri, sayî Weje				Bük û ... Lorandin	
Cinavkek		Şami, Misirce		Ol Çil....	7
Tûj		Zil			
Hetaw, xor Yekineyekî leşkerî	Dawera ziv Parkitek	6	Pêrkitek Qertefâ neyîni		
			Nêzîk (heremki) Dawera karbonê		
	4	Bi kirdki 'jin'		5	

PEYVA VEŞARI →



1 2 3 4 5 6 7





- Li ser navé  
Gündem Basın ve  
Yayınçılık  
San. Tic. Ltd. Şti. (adına)  
Xwedi (Sahibi)
- SELAHATTİN DELİ
- Yönetim Yeri  
Çakırğa Mah. Sorguçlu  
Sk. No:11/6  
Tel: (0212) 530 01 40
- BÜROYA İRTİBATË  
(İrtibat Bürosu)  
Ayhan İlk Sk. No:23/3  
Beyoğlu/İSTANBUL  
TEL: (0 212)  
251 79 37-251 90 13  
FAX: 251 95 85
- Munchen:  
(Nümeri Gifî yê Errîpâyî)  
Mahmut Gergeli  
Tel: 49 871 672 29  
Fax: 49 871-670 815
- Brûksel:  
Medeni Ferho  
32 532 721 12 03
- Swište:  
İhsan Kurt  
Tel-fax  
41 21 652 76 07
- Bonn:  
Ahmet Baraçlıç  
49 228 66 17 40
- Hollanda:  
S. A. Fewzî  
31 104 85 55 43
- Suriye:  
Jana Seyda  
Helim Yusiv

Hezaran êrîşanê dewlet û çeteyan peyra jew fek ra:

# 'Dewleta kiştox'

**R**oja hewtiyesê gulanî de, seba protestokerdinê êrîşê çeteyan û dewletê ke saziyanê kurdan û demokratikan sero bi hovî virazyenê, verniyina HADEP de hema hema hemû şarîstanan de hetê desthezaran kesî ra amey protestokerdin.

Panciyes hezar kes roja 17 menga gulan de saet 13.00 de taxa Ofis de banê HADEP'a Amedî verde amey pêser. Hêzanê ewletiyê dewlete, seba ke, şar nîreso pê hetek û şêlik vêşî nêbo, pêro rayey girotibî binê ablûqa. La belê, hewna (ancî) panciyes hezar kes banê HADEP verde de risay pê hetek. Bi çepik, tilîlî û sloganana êrîşê çeteyan û dewleta protesto kerdi.

Miting de, şaxê HADEP'a Amed yew mocnayinê çapemenî wend. Mocnayinê çapemenî de, Serokê HADEP'a şaxa Amed Selim Kurbanoglu wina vat: "Şaxên IHD û NCİM'ye Amed û Riha hetê dewlete ra amey qefelhayin (racenayin). Rojnameyê Ü.Gündem amewo qedexekerdin. Kesên welatpêz û aştiwazî hetê ülkücüyanê faşistan ra bi bêbxtî yenê qetilkerdin.

Serok û serdarê HADEP pêro hay zindanan de. Çiqas kesê demokrat û aştiwazî estê ya hay zindanan de, ya jî yene kiştin. Endamê sendikayan vêşêri jî, ê KESK bi taybeti, ê Amedî yenê sir-günkerdin. Na peynî de jî, Serokê Pêro-yê IHD'ê Akın Birdalî rê hetê çeteyanê dewletê ra suikast ame kerdir. Serokê

"Nê êrîşê hovî seba ci benê? Seba ke, ma aştî, azadî, demokrasî û biratiya şaran wazenê. Seba ke ma vanê: Arîseya (mesela) tewrê pîl a Tirkîye; doza kurdan a. Seba ke ma wazenê doza kurdan, ne bi darê zore û rişnayinê gunî, la belê, bi awêka aştîyane û demokratik bêro çareserkerdin. Seba ke ma heqanê xo yê meşrûyan wazenê, endêk êrîşî ma ser benê?"



HADEP Selim Kurbanoglu vatenê xo wina dewam kerdi: "Nê êrîşê hovî seba ci benê? Seba ke, ma aştî, azadî, demokrasî û biratiya şaran wazenê. Seba ke ma vanê: Arîseya (mesela) tewrê pîl a Tirkîye; doza kurdan a. Seba ke ma

wazenê doza kurdan, ne bi darê zore û rişnayinê gunî, la belê, bi awêka aştîyane û demokratik bêro çareserkerdin. Seba ke ma heqanê xo yê meşrûyan wazenê, endêk êrîşî ma ser benê?"

Gama mocnayinê çapemenî ame

wendin, şêligi enê sloganî eşti (çekardi): "Kurdistan faşizmî rê beno goristan!", Bijî biratiya şaran!, "Bimro faşizm!", "Şehîd nêmire-nê!", "Zordarî ma nêvindarnenê!". A game polisan çar hetan ra bi jop, qelas û ciwan rayde êrîş kerd şarı ser. Se û pancakes kes girotiyay binçim. Nînan miyan de Serokê HADEP'a Amed M. Selim Kurbanoglu, rayedar (serdar) M. Can Tekin, Nûran Ekdî estîbi. Hewna se kes vêşêri jî dirbetinî bîbi ke, rayedarê HADEP'a şaxê Amedî, M. Şêrîn Şehir paç rojî rapor girot. Êkê girotiyay binçim, badê dikrojan viradiyay.

Seba protestokerdinê êrîşanê dewleta tirk, şarîstananê bînan de jî hetê hezarana ancî verniyina HADEP de amey protestokerdin. Protestokerdinan de endamanê HADEP, êrîşê dewlet û çeteyan sloganê "Dewleta kiştox!", "Kütikê Çatlı nêşenê ma bitarsayn!" çekardi. Polisan xeylê ca de endamanê HADEP rê êrîş virast û xeylê mardimî girotî binçim.

# Kaniya zelal ‘ab-i heyat’ hemû rengê gulan av dide

*Iro şax û bêbna vê bibarê li her bêlê batiye belavkirin. Mirovê Mezin, di navenda vê bibara gerdûnî de bûye kaniya jiyanê. Yanî kaniya ku rih dide miriyan, aqil dide nezanan, hêzê dide lawazan, ziman dide lalan, çav dide koran û gub dide keran. Çiqas rengê gulan bene jî, ji vê kaniyê têne avdan.*

**Z**ivistana tarî, sar û seqem, reşîya xwe vegirtibû li ser xweza û mirovatiyê. Bi wê ba û bagera xwe ya tûj hemû zindi kirbûn esîrê xwe. Heçî zindiyê ku serê xwe radikir, zivistanê bahoz û bagera xwe ya hişk bi ser de ro dikir, da ku çavên wî/wê bi ber bihara rengîn û azad nekeve.

Vê zivistanê, xwe bi awayekî kûr berdida rihê hemû zindiyan. Hemû hêz û derfeta xwe bi awayekî hov bi kar dianî, da ku xweza û rihê tevahiya mirovan bi ke yek reng; rengê tarî. Tariya ne-xwes, tariya bêbext, tariya xayin û tariya ku ji diz û hovan re heval e. Yanî wêdixwest rihê faşizmê li ser tevahiya cihanê bide meşandin. Ji bo ku temenê xwe dirêj bi ke, rê nedida demsala bîharê. Ew bihara ku dil û kezeba evîndaran hênik dike, çavên dayik û bavan ronî dike, hêviya kedkaran xurt dike û berhemên cotkaran bi tîna rojê germ dike.

Vê zivistana sar, rihê mirovan mîna herêma Sibiryayê dikir cemed. Dil dikir weki giyayê li ber sirê zerik û cilmissi, tim li hemberî jiyanê nexwes. Mejî kiribû ke-virekî hişk, ajotkar xistibûn lebatê. Di şuna xebata mêjî de, ajo (gündü) didan xebitandin. Xweza jî, hemû dibû beyar mîna çola Erebîstanê. Ew çola bêav, bêhêşinâhî, tev qûm û bê bayê hênik.

Li hemberî vê zivistana xedar, bîharê serî neditewand. Pêr li Bajarê Şikago bi lehengiyeke xurt serî rakir. Lê mixabin ji ber hin sedeman zû hat û zû çû. Wan tovîn bîharê di kûrahiya dilê lehengan de xwe da parastin. Li benda roja xwe bû.

Duh, bîharê li Moskovayê serî bilind kir. Perçeyekî mezîn ji zivistana qetand. Wi tovî jiyanê careke din şax da. Şaxen xwe li pir deveran gerandin. Li wir jî nikaribûn vî rihê mezîn bidana parastin. Dîsa zivistana ew bîhar pêlişand, lê nikaribû wî tovî hişk-bike û bike esîrê xwe jî. Lewre ew tov bi xwîna gelek lehengan hatibû reşandin û rehêna xwe di bin erdê de gelek kûr berdabûn.

Iro wî tovî li Welatê Rojê aj da. Bi serbilindî û bi mîrxasiyeke mezîn li dijî zivistana serî rakir û bi heybet şax da. Her cendî zivistana ew qas êrîş, bahoz û xe-



zeb bi ser vê bihara rengîn ve şand jî, dîsa bi kîr nehat. Di vê bîharê de her cureyeke kulîlkan bi awayekî serbest û azad serî rakir.

Zivistana reş, li hemberî bihara Welatê Rojê hate çîrandin. Bê dil û xwesteka xwe bipaş ve reviya û ji hev belav bû. Ev bîhar ne mîna bihara pêr û duh e. Ji wan bêhtir bihareke nûjen û gerdûnî ye. Ev tovî hêviyê ji aliye Mirovê Mezin ve tê nûjenkirin. Çerxa karker û kedkaran bi pisporiyeke zanistî dizivirîne. Bi zivirdina vê çerxa şoresserî re, bîhar kire bihareke gerdûnî li dijî hovan.

Lewra vê bîharê, tovî wê bihara pêr û duh ku xistibû bin erdê û nedîhiştî ku ew şîn were, ji nû ve av da, qurmê xwe kola, da şînkin û kir ku şaxen xwe berde her çar aliye cihanê. Iro şax û bêhna vê bîharê li her hêlê hatiye belavkirin. Mirovê Mezin, di navenda vê bihara gerdûnî de bûye kaniya jiyanê. Yanî kaniya ku rih dide miriyan, aqil dide nezanan, hêzê dide lawazan, ziman dide lalan, çav dide

koran û guh dide keran. Çiqas rengê gulan hene, ji vê kaniyê têne avdan. Yen ku ji vê kaniyê avê vedixwin ji hemû taybetmendiyen hêzên tarî têne şüştin.

Lewre ji-dilê vê kaniya zelal, “ab-i heyat” tê herikandin. Taybetmendiyen vê avê, ev in ku, dijiminê hemû qirêjî û nebaşyan in. Çiqas kaniyên bi jehî hene, yek bi yek dimîciqîne. Bi miçiqandina van kaniyên herimî re, bîhar û xweza bi awayekî serbest kirâsê xwe yê rengîn bi ser xwe de berdide. Mirovê vê bîharê jî têne xweşikirin. Ji ber ku ne zor, ne tadehî û ne jî xwarina kedê heye. Berevajî van jî biratî, wekhevî û jiyanekî azad heye. Li cihê ku ev riya xwes were pêkanîn, li wir cihê hovan namîne. Ji ber ku Mirovê Mezin rehê jiyanâ wan hovan qut dike û nahêle ku edî ew xisarê bidin mirovahî.

Di roja iro de çiqas perçeyen zivistana hene, bi awayekî qirêj, şareza û veşartî xwe digihêjînin hev, xwe dike yek û êrîşî ser kaniya jiyanê dike. Dixwazin vê

“Sîrîn in mîna hingiv, spî ne mîna şîr, cemidî ne mîna berfê.”

“ab-i heyatê”, ku mîna ava zemzemê zelal e, bîmiçiqînin. Lewre her gulek li ber vê kaniyê ku tê mezinkirin, dibe hêzek li dijî hovan.

Her gulek û her kulîlkek, ji van gûlî kulîlkan bi ava vê kaniyê dibe deh, dibe sed, dibin hezar û dibin milyon. Ew gûlî û kulîlkek ji her hêlê tovê xwe direşînîn, peyre şîn têne û wan gihayen bi jehî dinava xwe de hişk dike. Bi vê yekê tîrsîke mezîn bi wan giyayen bi jehî dikeve. Lê ava vê kaniyê cendî ku dijwar e, tiştek xwe li ber nagire. Ne gengaz e ku, edî ev kaniya jiyanê bîmiçiqe. Roj bi roj ava wî gurtir dibe, wekî Çemê Ferat û Dijle di herike. Ev ava heyatê, ji giyayê nebas û ji sewalîn hov re dibe jehî, ji. gul û kulîlkan û ji tiştîn baş re jî dibe derman. Kaniyên wisa, tu carî bi der nebûne û neha-tine dîtin. Mîna wan çemîn li Bihûsta Fîrdews, ku di olan de dibêjin: “Sîrîn in mîna hingiv, spî ne mîna şîr û cemidî ne mîna berfê.”